K.T.
Zanîngeha Dîcleyê Enstîtuya Zanistên Civakî
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

DERSA KURDÎ (KURMANCÎ) Û DRAMAYA DAHÊNER

Merve ÇOBAN KAYNUN
21933105

Şêwirmend
Doç. Dr. Faruk KAZAN

Diyarbakır 2024

T.C
Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Ana Bilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

KÜRTÇE (KURMANCÎ) DERSİ VE YARATICI DRAMA

Merve ÇOBAN KAYNUN
21933105

Danışman
Doç. Dr. Faruk KAZAN

Diyarbakır 2024

TAAHHÜTNAME

SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Dicle Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum **"Dersa Kurdi (Kurmanci) û Dramaya Dahêner" (Kürtçe (Kurmancî) Dersi ve Yaratıcı Drama)** adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin kâğıt ve elektronik kopyalarının Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

25.11.2024

Merve ÇOBAN KAYNUN

PÊŞGOTIN

Gelek nêrîn û raveyên cuda hene li ser peyva perwerdeyê. Peyva perwerdeyê li gor cihê tê bikaranîn û li gor maneya ku tê gotin, pênaseyên wê diguherin. Bi gotineke gelemperî em dikarin bibêjin ku peyva perwerdeyê tê wateya çalakîyên hînkirinê yên ku ji bo pêşxistina zanîn, jêhatîbûn û nirxên mirovan têne kirin. Perwerde pêvajoyek e ku bi beşdarbûna di prosesa fêrbûnê de dihêle ku kes zanyarîyan bi dest bixin, şîyanên xwe bi pêş bixin, jêhatîbûna ramana xwe zêde bikin û bi nirxên civakî re bibin kesên lihevhatî. Perwerde alîkarîya kesan dike ku xwe bi pêş bixin, potansîyela xwe eşkere bikin, di karîyera xwe de pêş bikevin û ji pirsgirêkên civakî re çareserîyan peyda bikin.

Perwerde di jîyana mirovan de qadeke giring e. Lewra dema meriv têne ser rûyê dinyayê wek rûpeleke çilspî, peyre herçî diçe bi hînbûnên ji derûdor, ev rûpel rengîntir dibe. Bandora perwerdeyê herî zêde bi destpêkirina xwendingehê re dîyar dibe. Êdî hînbûneke sîstematîk tevî pirtûk û mamosteyan dikeve nava jîyana merivan. Dema em vedigerin li jîyana xwe ya xwendin û xwendingehê dinêrin, mamosteyên ku herî zêde kêfa me jê re tên hêj di bîra meriv de ne. Ser da jî mamosteyek hebe eleqeyeke taybet nîşanî merivan bide û piştî dersê pişta xwe bi merivan de nekiribe û neçûbe, ew mamoste tu car ji bîra merivan naçe.

Di karê perwerdeyê de li gor min mesele tenê hînkirina dersê û mijaran nîn e, zarok di temenên xwe yê piçûk de êdî dikeve nava jîyana xwendingehê. Ji malbata xwe bêhtir wextê xwe bi mamoste û hevalên xwe re derbas dike. Lewma divê li xwendingehan mesele tenê ne hînkirina ders û mijaran be. Divê perwerde li ser kesayet, fikr, xeyal û nêrînin zarokan jî bandoreke erênî çêbike. Ji bo ku ev yek pêk bê, divê têkilîyeke baş a mamoste li gel xwendekaran hebe. Divê mamoste dersa xwe ji awayê hînkirineke yekalî bişo û rê li ber xwendekaran veke da ku xwendekar jî daxilê nava dersê bibe. Di çarçoveya vê fikrê de min xwest li ser xebatek bi vî rengî bixebitim û dersên Kurdî bi rengekî cuda bixemilînim.

Di nava vê xebata xwe de em li ser rewş û perwerdeya zimanê Kurdî sekinîn. Di beşa yekem de me hewl da ku em xebatên derbarê perwerdeya zimanê Kurdî de hatine kirin ji çerxa navîn heta rewşa îroyîn, li ber çavan raxin. Giringîya ziman û zimanê zikmakî çi ye? Di hînkirina zimanan de xalên giring û bingehîn kîjan in, em li ser van xîman sekinin. Di beşa duyem de, dramaya dahêner çi ye, li ser taybetîyên

rêbaza dramaya dahêner û li ser pêngav û vesazkirinên wê sekinin. Rêbaza dramaya dahêner a ku di nav salên dawî de di her qadê de cihê xwe girtîye, em li ser xebitîn ku çawa kanibin li ser dersa Kurdî (Kurmancî) tetbîq bikin. Mijarên ku ji bo dersa Kurdî (Kurmancî) hatine hilbijartin ji pirtûka dersa Kurdî (Kurmancî) ya pola pêncan hatine hilbijartin. Mînakên ku hatine amadekirin ji bo çalakîya dersê dikare bête bikaranîn. Sedema hilbijartina vê xebatê wekî me li jor behs kir, dersa Kurdî ji hûnbûneke yekalî rizgar bikin û xwendekaran di nava dersa Kurdî (Kurmancî) de aktif bikin. Bi saya dramaya dahêner, têkilîyeke xurt di nava polê de peyda bikin. Bi rê ya dramaya dahêner hem xwendekar hevdu baş nas bikin, hem jî mamoste xwendekarên xwe baş nas bike.

Li gor lêkolînên ku min kirin, heta niha xebateke bi vî rengî ji bo dersa Kurdî (Kurmancî) nehatîye kirin. Ji ber vê yekê di nava xebata xwe de me hem cih daye plansazîya dersê û hem jî li ser tedbîqkirana derse sekinin. Ji ber ku min xebateke bi vî rengî nedît, wek xebateke destpêkê min xwest di vê çarçoveyê de bimîne.

Di dawîyê de ez dixwazim spasîya xwe ji şêwirmendê tezê Dr. Faruk Kazan re bikim. Her wiha dixwazim spasîyên xwe ji jurîyên tezê Doç. Dr. Kenan Subaşı û Prof. Dr. Tahirhan Aydın re pêşkêş bikim ji bo rê nişan dayîn, rexne û pêşnîyazên wan, mijara teza min qîmetdar dîtin û destûr dan ku ez bi dawî bikim. Bi nêrîn û pêşnîyazên mamosteyê hêja Dr. Nevzat Eminoğlu, teza min berfirehtir bû û ew bû alîkarê min ku ez kanibim berfirehtir li ser teza xwe bixebitim.

Merve ÇOBAN KAYNUN
Dîyarbakır 2024

KURTE

Armanca vê xebatê ya sereke, di perwerdeya zimanê Kurdî de wek çalakî bikaranîna rêbaza dramaya dahêner e. Di nava mijara tezê de em dê li ser van hêmana hûr bibin; dramaya dahêner di eslê xwe de çi ye? Pêngav û vesazkirinên dramaya dahêner çi ne? Em dê di nava tezê de taybetîyên dramaya dahêner li ber çavan raxin. Di nava çarçoveya tezê de em dê li ser rewşa perwerdeya zimanê Kurdî ya li Tirkîyeyê tê dayîn rawestin. Em dê li ser materyal û alavên di warê dersa Kurdî de li xwendingeha tê bikaranîn bisekinin. Ev metaryal û amûrên hene, têra perwerdeya Kurdî (Kurmancî) dike an na?

Tevî van xalan ev xebat dê li ser mijarên pirtûka MEBê ya pola 5an ji bo dersa Kurdî (Kurmancî) hatîye amadekirin, bixebite. Mijarên di pirtûka MEBê de derbas dibin ji bo çalakîya dramaya dahêner hatîye hilbijartin. Ev xebat tevî armanca xwe ya sereke bide zanîn ku "Rêbazên klasîk yê hînkirina ziman çi ne? Ev rêbazên klasîk çiqas têrê dike?" dê bersiva van pirsan bide.

Peyvên Sereke

Ziman, Zimanê Kurdî, Perwerde, Dramaya Dahêner, Dersa Kurdî

ÖZET

Bu çalışmamızın temel amacı Kürtçe dil eğitimin de, ders etkinliği olarak kullanacağımız yaratıcı drama tekniğidir. Tezimizin konusu içerisinde ele alacağımız unsurlar; yaratıcı drama nedir? Yaratıcı dramanın oluşumu ve aşamaları nelerdir? Diğer bir unsur ise, yaratıcı dramanın özelliklerini belirtmektir. Konumuz çerçevesinde TürkIye'de verilen Kürtçe ders eğitimi üzerinde duracağız. Kürtçe dil eğitimin de okullarda kullanılan materyal ve malzelerden bahsedeceğiz. Bu kullanılan materyal ve malzemelerin yeterliliği üzerinde duracağız.

Bunlarla beraber çalışmanın son bölümün de MEB tarafından 5.sınıf Kürtçe (kurmanci) dersi için hazırlanmış olan kitabın konularını baz alarak, ders etkinliği amacıyla yaratıcı drma tekniğini konular ile buluşturacağız. Bu çalışma, konunun temel amacıyla beraber klasik dil öğretim teknikleri nelerdir? Bu klasik dil öğretim teknikleri ne kadar yeterlidir? gibi sorulara cevap verecektir.

Anahtar Kelimeler

Dil, Kürtçe Dili, Eğitim, Yaratıcı Drama, Kürtçe Dersi

ABSTRACTS

The main purpose of this study is the creative drama technique that we use as a lesson activity in Kurdish language education. The elements we will discuss within the subject of our thesis are; What is creative drama? What are the formation and stages of creative drama? Another element is to indicate the characteristics of creative drama. Within the framework of our subject, we will focus on the Kurdish language education given in Turkey. We will talk about the materials and materials used in schools in Kurdish language education. We will focus on the materials used and their adequacy.

In addition, in the last part of the study, we will combine the creative drama technique with the subjects for the purpose of the course activity, based on the subjects of the book prepared by the Ministry of Education for the 5th grade Kurdish (Kurmanci) course. While this study examines the main purpose of the subject, it will also try to answer questions like what are the classical language teaching techniques? How sufficient are these classical language teaching techniques?

Key Words

Language, Kurdish Language, Education, Creative Drama, Kurdish Lesson

NAVEROK

Hejmara Rûpelan

PÊŞGOTIN ..... **I**
KURTE ..... **III**
ÖZET ..... **IV**
ABSTRACTS ..... **V**
NAVEROK ..... **III**
DESTPÊK **1**
1.ÇARÇOVEYA TEORÎK **1**
RêbazaTezê **1**
Mijara Tezê **1**
Armanca Tezê **2**
Giringîya Mijarê **2**
BEŞA YEKEM **4**
1. ZIMANÊ KURDÎ Û PERWERDEYA BI ZIMANÊ KURDÎ .. **4**
1.1. Zimanê Kurdî Di Dirêjahîya Dîrokê de 4
1.2. Di Dîrokê de Ceribîna Perwerdeya Bi Kurdî 6
1.3. Rola Medreseyan Li Ser Ziman û Perwerdeya Kurdî 8
1.4. Pirtûkên Dersê yên Bi Kurdî Di Medreseyên Kurdî de 10
1.5. Perwerdeya Bi Kurdî Di Serdema Modern û Rewşa Îroyîn de 12
2. ZİMAN **15**
2.1. Zimanê Zikmakî 17
2.2. Perwerdeya Zimanan 19
2.1.1. Guhdarîkirin 20
2.1.2. Axaftin 21
2.1.3. Xwendin 21
2.1.4. Nivîsandin 22
2.1.5. Rêziman 23
3. ÇANDA PİRANÎ Dİ HÎNBÛNA ZİMANAN DE **23**
BEŞA DUYEM **25**
DRAMAYA DAHÊNER **25**

2.1. Dramaya Dahêner 25
2.1.1. Perwerde û Dramaya Dahêner 29
2.1.2. Lîstik û Dramaya Dahêner 30
2.1.3. Şano û Dramaya Dahêner 32
2.1.4. Pêngav û Vesazkirina Dramaya Dahêner 33
BEŞA SÊYEM 38
MÎNAKA PLANSAZÎYA DRAMAYA DAHÊNER JI BO DERSA KURDÎ (KURMANCÎ) 38
3.1. Malbat 39
3.2. Hevnasîn 41
3.3. Hejmar 43
3.4. Çîroka Şengê û Pengê 46
3.5. Pîşe 50
3.6. Xwendingeha Min 52
3.7. Jîyana Gund û Bajaran 54
1.TETBÎQKİRİNA DU DERSAN Lİ GEL XWENDEKARAN ... 57
1.1. Malbat 57
1.2. Çîroka Şengê û Pengê 63
ENCAM 72
ÇAVKANÎ 74
GENİŞLETİLMİŞ TÜRKÇE ÖZET 77

DESTPÊK

1.ÇARÇOVEYA TEORÎK

RêbazaTezê

Ev xebata li ber destên me, ji bo fêrkirina zimanê Kurdî li ser rêbaza dramaya dahêner xebitîye. Rêbaza dramaya dahêner di her qadê de û ji bo her mebestê tête bikaranîn. Ev rêbaz di qada perwerdeyê de bêsînor xîtabê her temenê dike. Me jî hewl da ku rêbaza dramaya dahêner bixin nava çalakîyên dersa zimanê Kurdî (Kurmancî). Rêbaza dramaya dahêner ji bo têkilîya mamoste û xwendekaran û ji bo têkilîya xwendekaran bi hevdu re xurt bike amrazeke ku divê ev rêbaz ji bo her dersê bête bikaranîn. Helbet ev rêbaz tenê di qada perwerdeyê de jî sînordar nebûye.

Rêbaza xebata me ev e ku li gor vesazkirin û pêngavên dramaya dahêner ji bo dersa Kurdî çalakîyên dersê amade bike. Rêbaza dramaya dahêner ji pêşdibistanê bigire heta zanîngehê jî meriv dikare di nava dersa xwe de li gor mijar û armanca dersê wek rêbazekî bikarbîne. Ji bo ku em xebata xwe sînordar bikin, em ê tenê li ser mijarên di pirtûka dersa Kurdî (Kurmancî) ya pola pêncan bisekinin.

Mijara Tezê

Mijara teza me di perwerdeya zimanê Kurdî de wek çalakîya dersê, rêbaza dramaya dahêner e. Di warê perwerdeya zimanê Kurdî (Kurmancî) de gelek kêmasî hene. Em dê rêbaza dramaya dahêner wek çalakîya dersê, li dersa zimanê Kurdî (Kurmancî) zêde bikin. Îro li hemberê gelek astengîyan di hin qadên perwerdeyê de zimanê Kurdî, di bin banên dibistanan û avahîyan de tê hînkirin. Mijara teza me, ne ew e ku van astengî û zehmetîyan yek bi yek lêkolîn bikin. Mijara teza me ew e ku tevî van zehmetî, astengîyan em dê çawa kanibin perwerdeyeke biqalîte nîşan bidin. Îro em dinêrin ku li ser rûyê dinyayê ji her alîyekî ve tiştinên nû û tiştinên balkêş diqewimin. Qada perwerdeyê jî di nava vê çûyin hatinê de para xwe ji vê yekê digire. Lewra ev tiştên diqewimin bandorê li ser ser çand, ziman, perwerdeyê heta bêjî li ser xwarin û vexwarin û li ser cilûbergên merivan jî dikin. Helbet ji ber ku mijara me perwerde ye em dê di vê çarçoveyê de behsa mijara xwe bikin.

Perwerdeya ku ji bo Kurdan li medresayan bi tîpên Erebî dest pê kiri bû, îro bi tîpên Latînî li dibistanan cihê xwe digrê. Di perwerdeyê de gelek rê û rêbaz hene.

Ev rê û rêbazana wek teknîkên hînkirina dersan ji bo mamosteyan dibe alîkar. Yek ji van rêbazan dramaya dahêner e. Em dikarin bibêjin ku dramaya dahêner bi rêya lîstikan vegotina dersê ye. Bi saya vê vegotinê, zarok di dersê de aktîf dibin. Zarok tevî fikr, raman û azmûnên xwe daxilê nava dersê dibe. Ev tez li ser plansazîya dramaya dahêner sekinîye, ji bo dersa Kurmancî ya li dibistanên navîn ya di pola 5an de.

Armanca Tezê

Di vê tezê de mebest ew e ku di warê hînkirina perwerdeya Kurdî de kêmbûna materyal, alav û amûran li ber çavan raxe. Di qada Kurdî de ji bo edebîyat û perwerdeya zarokan pir kêm pirtûk hene. Ev pirtûkên heyî çiqasî têra vê yekê dikin cihê gengeşîyê ye. Armanca vê tezê ew e ku çalakîyan li dersa Kurdî (Kurmancî) ya li dibistana navîn tê dayîn bi rêbaza dramaya dahêner zêde bike. Bi rêbaza dramaya dahêner paceyeke nû veke ji bo nişandayîn û hînkirina zimanê Kurdî. Bi vê rêbazê dê dersên Kurdî ji alîyê xwendekaran ve bi kelecanî û baldarî bê şopandin. Ev tez, hewl dide ku daxwaza hînbûna xwendekaran li hemberê dersa Kurdî zêde bike. Rê li ber geşbûna zimanê Kurdî veke.

Xebata tezê, rê li ber hînkirineke rijî digire û hewl dide ku xwendekaran di pêvajoya hînbûnê de daxilê nava dersa Kurdî (Kurmancî) bike. Bi saya dramaya dahêner mamoste dikare xwendekarên xwe baştir nas bike û azmûn, serborî, fikr û xeyalên xwendekarên xwe bi lîstika dramaya dahêner bixwîne û hîn bibe.

Giringîya Mijarê

Giringîya mijara tezê ew e ku di qada perwerdeyê de kevirekî li banê perwerdeya Kurdî zêde bike. Bi saya rêbaza dramaya dahêner xwendekarên Kurdî dê hem hînê ziman bibin hem jî bi çalakîyan di nava dersê de aktif dibin. Xwendekar bi her awayekê dikare hînê mijarên dersan bibin. Lêbelê rêbaza dramaya dahêner tenê giringîyê nade hînkirina mijarê. Dema mijarekê hîn dike, rê li ber xwendekaran vedike ku xwendekar bixwe kanibin li ser mijarê bifikirin, pirgirêkan tespît bikin û wan pirsgirêkan kanibin çareser bikin. Di nava vesazkirina dramaya dahêner de jixweberî heye. Dema xwendekar di dikevin nava dramaya dahêner êdî ji bo ku kanibin bigihêjin encamê, qabîlîyetên xwe çi hebe derdixe holê. Ev yeka jî tenê xwendekaran hînê mijarê nake, pê re dawîya dawîn xwendekarên hay ji qabîlîyetên

xwe hene, bi xwe bawer û xwendekarên bi hêsanî kanin fikrên xwe bîne ser ziman derdixe holê.

Dramaya dahêner dixwaze bi rêya perwerdeyê van xîman pêk bîne. Kesên jixwebawer, kesên têra xwe dike, xwe nas dike, bi derûdora xwe re bi hêsanî têkilîyê datîne û bi hêsanî Karibe fikrê xwe bîne ser ziman. Bi kurtasî em dikarin bibêjin ku bi saya rêbaza dramaya dahêner mamoste hem dikare mijara xwe vebêje û mijarê hînî xwendekaran bike û hem jî xwendekarên xwedî hişê rexneyî û hişê lêkolîner pêk bîne.

BEŞA YEKEM

1. ZIMANÊ KURDÎ Û PERWERDEYA BI ZIMANÊ KURDÎ

1.1. Zimanê Kurdî Di Dirêjahîya Dîrokê de

Zimanê Kurdî yek ji zimanên Îranî ye, ku ser bi malbata Hînd û Ewropî ve ye. Lewma hevbeşîyên zehf di navbera Kurdî û zimanên din ên Îranî de hene. Ev wekhevî û nêzîkîya navbera hinek zimanên dinê, bûye sedema destnîşankirina malbatên zimanan. Kurdî ji çar şaxên sereke pêk tê. Şax, zarava, varyant di hemû zimana de hene. Ev yek ji bo zimanan ne kêmasî ne. Zaravayên zimanên Kurdî ev in: Kurmancî, Zazakî/Dimilî, Soranî Û Goranî/Lorî ne. Goranî qedîmtirîn zaravayê Kurdî ye ku edebîyata nivîskî ya Kurdî pê hatîye destpêkirin. Destpêka edebîyata nivîskî ya bi Kurdî ya Goranî/Lorî ji hezar salî zêdetir e. Berhema bi navê *Dubeytî* ya Baba Tahirê Hemedenî / Loristanî di sedsala 11an de di salên 1010 û 1015an de bi vî zaravayê Kurdî hatîye nivîsîn (Adak, 2015: 75).

Kurdî girêdayî nasnameya gelê Kurd e. Gava em li rewşa îroyîn dinêrin em dibinin ku zimanê Kurdî, zimanekî qedîm e û bi kok û risasên xwe wek dareke temen dirêje û li ser xwe ye. Di warê perwerdeya zimanê Kurdî de gelek xebat hatine kirin. Ji ber ku tev baş nehatine parastin hin çavkanî winda ne hin çavkanî jî heta roja me hatine (Khalıd, 2019:3). Rewşa ziman, biwê newê bi dîroka miletan ve jî girêdayî ye. Fonksîyona zimanan qasê serbestîya xwe û qasî xebatên ku li ser tê kirin pêş dikeve an jî di cihê xwe de dimîne. Taybetmendîyên statuya zimana bi rewşa çandî, dîrokî û aborî ve girêdayî ne. Gelek rewş û bûyeran guherîn li ser zimanê Kurdî pêk anîye.

Zimanê Kurdî wekî zimaneke minorîtî bi giştî ji sê serdemên giring derbas bûye, ango di sê serdemên cihê de ji ber bandorên sîyasî, civakî û aborî statuya zimanê Kurdî ya di nav civakê de guherîye. Ev sê serdem serdema feodalîteyê, serdema netewe dewletê û serdema hilweşandina netewe dewletê (deconstructed nation state) ne. Li gor qeneta me serdema feodalîteyê bi hatine Selçûqî û osmanîyan nav axa Kurdîstanê dest pê dike. Serdema duyem jî piştî Şoreşa Frensî dest pê dike ku em dê vê serdema weke serdema netewe dewlet pênase bikin û vê serdemê jî di nav xwe de, em dê bikin du beş. Beşa yekem ji Şoreşa Frensî heya hilweşandina Dewleta Osmanî, beşa duyem jî ji hilweşandina Dewleta Osmanî heya

salên şêstî ye. Serdema sêyemîn serdema hilweşandina netewe dewletê ye ku piştî şerê cîhanê yê duyemîn dest pê dike. (Şirin, 2015: 92)

Nêrîna di vê jêgirtîya di jor de bi qenaeta me digel hin rastîyan hin xeletî jî hene. Nivîskar Şirin maceraya zimanê Kurdî û statuya ziman ji hatina selçûqî û osmanîyan a bi herêma Kurdan dide dest pê kirin û vê serdemê jî di asta feodaliteyê de mehkûm dike û davêje nav bêqimetîyê. Hal ew hal e ku çîrok û dîroka nivîs û perwerdeya zimanê Kurdî berîya dîroka selçûqî û osmanîyan dest pê dike. Di nav Kurdên Rojhilat ên li herêm û navendên wek Hemedan, Aran, Anî, Gence û hwd. bi navê Medreseyên Kurdan di sedsala 9. û 10an de medrese ava bûn (Keleş, 2014: 78).

Kurdan di van sedsalan de dewletên bi navê Şeddadî, Hesenweyhî û paşê sed sal şunda û berîya selçûqîyan jî li Bakur bi navê Merwanî dewleteke din ava kirin ku paytexta wê Meyafarqîna Dîyarbekirê bû. Ev dewlet jî bi medreseyên xwe û bi alimên xwe navdar bû. Di van dewletên nav borî yên di serdemên çerxa navîn de perwerde di medreseyên li van welatan bi Kurdî bû. Lewma di van medreseyan de şair, edebîyatnasên Kurdînûs yên wek Baba Tahirê Uryan/Loristanî, Baba Serhengê Dewdanî, Mela Perîşan û alimên wek Aynu'l- Qudat'ul Hemedanî, Ebu Hanife Dînewerî û hwd. Gihîştin û berhem li dû xwe hîştin (Izady, 2005: 89).

Bi qenaeta me kêmasîyeke Şirin a di nirxandina wî de ev e ku ew zimanê Kurdî di hemû dirêjahîya dîrokê de wek zimanekî kêmar û mînorîtî dibine û dinirxîne. Yanî li gor wî zimanî Kurdî di hemû tarîxê de wek zimanekî di rêza duduyan de cih girtîye. Qe tu car di rêza yekem de yanî wek major cih negirtîye. Bi qenaeta me xeletîya vê nêrînê, ji nezanîna nivîskar a hemû hêlên dîroka Kurdî ye. Lewra zimanê Kurdî di dewletên Şeddadî, Hesenweyhî, Merwanî û hwd. û di Mîrekti/Mîrnîşînên Kurd ên wek Cizîr, Hekkarî, Bidlîs, Bazîd, Erdelan, Îmadîye, Mikis, Hîzan, Hesenkeyf û hwd. de ku di belgeyên osmanî de wek "Hukumetên Ekrad/Hukumetên Kurd" dihatin binavkirin de bi saya medreseyên Kurdî zimanê major bû (Eminoğlu, 2023: 506).

Her wiha zimanê Kurdî wek zimanê perwerdeyê, edebîyatê, ticaret û civatê di gelek hêlên jîyana sosyal a wê serdemê de cih girtîye. Lewma xeyrîmuslimên wek Suryanî, Ermenî û Yahudîyên di nav coxrafya û civata Kurd a di çerxa navîn de di jîyana xwe ya rojane de zimanê Kurdî bikaranîne. Heta ji van civatên xeyrîmuslim şair û edebîyatnasên Kurdînûs derketine. Yek ji van jî Basilyosê Cizîrî

ye ku bi xwe keşîşekî şair ê suryanî ye û di sedsala 18an de dîwaneke bi Kurdî nivîsîye. Her wisa gelek ji van berhemên bi Kurdî yên van keşîşan di dêr û îbadetxaneyê xristîyanên li herêmên Kurdnişîn de wek metnê dua û ibadetê hatine xwendin. Di serdema navîn de gelek dengbêj û çîrokbêjên ermenî û suryanî derketine di nav civata Kurd de ku bi zimanê Kurdî muzîka xwe îcra kirine. Wek mînak, dengbêja jin Gula Filleh, Kerapêtê Xaço û hwd. (Adak, 2015: 179).

Bi kurtasî zimanê Kurdî di dirêjahîya dîrokê de gelek merhele derbas kirine. Her wisa guherîna qonax û çerx û dewranan ber û berhemên edebî yên devkî û nivîskî li dû xwe hiştine. Digel van berheman di sazîyên perwerden de ku medrese ne, wek zimanê perwerde, yanî wek zimanê ders û telîmê hatîye bikaranîn.

1.2. Di Dîrokê de Ceribîna Perwerdeya Bi Kurdî

Di sedsala 7an a piştî mîladê de bi pejirandina Kurdan a dînê îslamê re li erdnîgarîya Kurdan medreseyên wek sazîyên perwerde hatin avakirin. Van medreseyan digel rola xwe ya hîndekarîya teorî û pratika dînê nû, wek çavkanî û ceribîna perwerde bi zimanê zikmakî ya di Kurdî de jî wezîfe bi cih anîn.

Bi pejirandina dînê îslamê re rewşa Kurdan a civakî, çandî, aborî, sîyasî û hwd. Diguhere û Kurd dikevin nav pêşkevtinekê. Piştî sêsed salên xerabûn û pelçiqandinê yên di bin desthilatdarîya Sasanîyên Îranî û Împaratorya Bîzansî de derbasbûyî, di navbera sedsalên 7an û 9an de, hêza Kurdan a sîyasî ya ji nû ve şînbûyî, mohra xwe li serdemê dixe (Eminoğlu, 2015: 198).

Ev heyama ku di sedsalên 10an û 12an de dertê asta herî bilind, bi awakî heqdar, wek "Sedsalên Îslamê yên Kurd" tên binavkirin. Hakimîyeta Kurdan a sîyasî, bi saya fethên leşkerî û koçberîyê, ji Asya Navîn bigire heta Lîbya û Yemenê dirêj dibû. Kurdan him dewlet û xanedan ava kirin û herêmên navendî yên Rojhilata Navîn parastin him jî çanda Kurdî demên xwe yên zêrîn jîyan. Kurd di pêvajoya van hemû deman de, di warê felsefe, muzîk, muzikolojî, mîmarî, muhendisî, matamatîk û astronomîyê de bûne pispor. Di nav pêştatirên Kurd ên wê demê de, dirokzanên wek Ebul Fîda, Îbnî Esîr, Îbnî Şeddad û Îbnî Quteybe; fîlozofên wek Suhrewerdî, Ayn el-Qudat Hemedanî; muzîkologên wek Seyfeddîn Ûrmewî û Muhammed Îbnî Katib Erbîlî; muzîsyenên wek Îbrahîm û Îshaq Mawsîlî û Zeryab; mîmar û muhendisên wek Munîs; matamatîkzan û astrologê wek Muhyedîn Axlatî;

bîyografîstên wek Îbnî Xalîqan, ensîklopedîstên wek Îbnî Nedîm; şoreşgerên civakî û dînî yên wek Babek û Narseh, meriv dikare wek mînak bêje (Izady, 2005: 97).

Hêmaneke bingehîn a vê guherîna civakî ya di Kurdan de sazîya medreseyê bû. Lewra medreseyan di nav Kurdan de di hemû dirêjahîya sedsalên çerxa navîn de erka sazîya sereke ya perwerde pêk dianî. Li gor pêvajoya dîrokî zimanê Kurdî û medreseyên Kurdan ku çavkanîya perwerde bi Kurdî ne, ji destpêkê heta îro ji sê konax û serdemên dîrokî re derbas bûne û hatine heta îro. Serdema pêşîn a medreseyên Kurdan wek serdema Sultanên Kurd tên bi navkirin. Medreseyên Kurdan ji hêla çand, mezheb, etnîsîte, ziman û erdnîgarîyê ve standardekî nîşan didin û bi pêvajoya dîrokê re bi vî navî ketine lîteraturê. Medreseyên Kurdan, wek serdema sultanan, mîran û şêxan, bi sê qonaxên dirokî re derbas bûne û gihîştine heta roja me ya îroyîn (Epözdemir, 2015: 194).

Di serdema pêşîn de bûne xwedîyê erdnîgarîya xwe ya herî fireh. Bêhtir li bajarên mezin ên alema îslamê û li bajarên Kurdan ava bûne û ji alîyê hikumdar û sultanên Kurdan ve hatine çêkirin. Li navendên wek Dînewer, Hemedan, Şam, Heleb, Erbîl, Qahîre, Cizîr, Meyafarqîn, Ruha, Mêrdîn û hwd. Hatine sazkirin. Di serdema mîrektîyan de erdnîgarîya medreseyên Kurdan teng bûye û tenê xasê bi erdnîgarîya Kurdan maye. Bi piranî li bajarên Kurdan ên wek Bidlîs, Hekkarî, Bazîd, Hîzan, Heskêf, Mukus, Amedîye, Çemîşkezek, Şêrwan û hwd. Ava bûne.

Merheleyên ku medreseyên Kurdî derbaskirine ya duduyan de ev sazîyên perwerde bûne çavkanîya berhemên edebîyata Kurdîya klasîk. Pirtûkên Kurdî jî li medresan wek pirtûkên dersê/rêzê hatine xwendin. Her wisa bo Kurdan, bûne ceribîneke giring ji perwerde zimanê zikmakî re û xwedî roleke dîrokî ne bo pêkhatina çandeke hevpar di nav Kurdan de. Her wisa hevparîyek çandî, edebî û dînî jî çêbûye bi alema îslamê re. Di serdema sisêyan de medrese ji fînansorî û patronaja hikumdar û mîran bêpar û mehrûm mane. Rengînî û zengînîya dersan kêm bûne û tenê dersên dînî û fiqhî mane di mufredata medreseyan de. Lê medreseyên vê serdemê li dervayê erdnîgarîya Kurdan jî belav bûne bi saya xelîfeyên şêxên terîqetê. Li navendên wek Endonezya, Şam, Stenbol, Konya, Bexdad û hwd. jî ava bûne (Biruinnesen, 1995: 158). Di vê pêvajoyê de medreseyan derfetên xwenûkirinê nedîtine. Di vê serdemê de yanî di sedema dawîn de medrese ji bajaran zêdetir li gundan ava bûne.

Helbet ev meseleyên sîyasî bi xwe re civateke Kurd hildaye û danîye. Zimanê Kurdî jî li gor vê yekê şikil û dirûv girtîye. Di nava perwerde Kurdî de cihê medreseyan bêguman gelekî muhîm e. Di bin desthilatdarîya Mîrektîyên Kurdan de gelek medrese ji bo miletê Kurd hatîye ava kirin.

Zimanê perwerde yên Medreseyên Kurdan bi Kurdi ye. Ders bi zimanê Kurdi tê dayîn. Pirtûkên dersê/rêzê yên medreseyan her çend di destpêkê de hemû bi Erebî bûn. Lê hey ku çû yani ji serdema medreseyên sultanan ber bi serdema medreseyên mîran hat, zanayên Kurd pirtûkên dersê yên bi Kurdi jî nivisîn. Pirtûkên Erebî jî bi şîroveya Kurdi dihatin dayîn. Wuhareng ev sazîyên perwedehîyê bûbûn devera bicihanîna tore, tevger û rêveçûna kurdayetîyê ji. Lewra di wan de toreya kurdî, ji wergirtinê bigir û hemû edetên kurdî dihatin pêkanin, kesayetîya nijadî derdixistin holê û mirovatîyê didane dîyarkirin (Eminoğlu, 2015:200).

Di medreseyan de hem îlmê dînî hem jî îlmê zanistî dihat dayîn. Bi dayîna van zanistan re bi saya alimên Kurdan, zimanê kurdî pêş ve ketîye û bûye zimanê zanistê. Ji ber ku aliman pirtûkên xwe yî îlmî ji bo zarokên Kurdan bi Kurdî dinivîsî. Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî ev kesên serekene ku berhemên xwe bi Kurdî nivîsandine û ev berheman ji sedsalên 15-16an heta niha hatine û îro jî li ser berhemên wan akademîya kurdî gelek xebat kirine û dikin.

1.3. Rola Medreseyan Li Ser Ziman û Perwerdeya Kurdî

Di dirêjahîya dîrokê de Medreseyên Kurdan ji bo çand û bawerîya Kurdan a serdema îslamî, bûye çavkanîya sereke. Lewra Kurdan dînê xwe, mezhebê xwe, adabê muaşeretê û bi kurtasî hêmanên şaristanîyeke nû ji van medreseyên xwe hîn bûne (Bidlîsî, 2010: 20). Her wisa ji bo peydabûna lîteratûra nivîskî ya Kurdî, pêkhatina zimanekî standart a di nav Kurdan de jî çavkanîya sereke Medreseyên Kurdan e. Lewra medrese wek dibistan û mektebên wê serdemê bûne cihê hînbûn û hînkirina ilm û zanyarîyê.

Tê xuyanê ku gorî gelek çavkanîyên dîrokî zimanê perwerde medreseyên di nav Kurdan de ji serê dewra îslamî de bi Kurdî bû. Lewra dîn û bawerî ji zimanê Erebî bi bal zimanê ehlê her welatî dihate wergerandin. Piştî serdema Emewî û Ebbasîyan di dewra Merwanî û Eyyûbîyan de ev medrese ji alîyê van xanedanên Kurd ve hîn bêhtir li nav erdnîgarîya Kurdan hatin belavkirin û xurtkirin (Bağusuy,

2009: 41). Xwendekar û feqîyên ji her derê welat diçûn van medreseyan. Wuhareng bi saya van medreseyan li seranserê welatê Kurdan Kurdîyeke yekawa û standart pêk hat û nimûneyên Kurdîya nivîskî jî derketine holê.

Serdema navîn û di salên 1514-1518an de dewleta Osmanîyan, bi alîkarîya mîrên Kurdan di şerê Çaldiranê de Sefewî têk birin. Bi vê îtifaqa Kurd û Tirkan a piştî îtifaqa pêşîn ku Sultanê Selçûqî Alparslan bi Kurdên Merwanî re kiribû, ji bo Kurdan serdemek nû dest pê kir û mîrektîyên Kurdan desthilatdarîya xwe bihêztir kirin (Özer, 2010: 133). Her wiha sazîyên wan ên sîyasî, dînî û perwerdehî ava bûn û geştir bûn. Di vê atmosfera rewşenbîrî de helbestvan perwerde bûn û di encamê de helbestên Kurdî derketin holê. Di vê serdemê de helbestvan li dora qesr û qonaxên mîran kom dibûn. Em dibînin gelek helbestvanên vê serdemê yên wekî Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Wedaî, Selîmîyê Hîzanî, Feqîyê Teyran û Harisê Bedlîsê li dora mîran rabûne û bûne helbestvanên wan. Bi vî awayî sîstema patronajîyê / hîmayeyê jî derketîye meydanê. Di vê serdemê de ji bo geşbûna edebîyata Kurdî faktora herî giring hebûna medreseyan bû.

Mirov dikare bibêje ku li her bajar û serbajarekî mîrektîyeke Kurdan ku di bin textê mîrekî de bû, medreseyên wan jî hebûn. Ev medrese bi mîmarîya xwe û bi sîstema xwe, ne medreseyên kêm bûn. Hinek ji van medreseyan wekî Medreseya Qubehanê û Medreseya Sor di asta medreseyên paytextên cîhana Îslamê yên wan deman bûn. Di van medreseyan de zimanê perwerde zimanê Kurdî bû. Vê yekê jî rê li ber derketina helbestên Kurdî vekir. Gelek helbestvan ji van medreseyan rabûn. Piranîya helbestvanên vê serdemê ji van medreseyan xwendibûn (Adak, 2013:177). Çand û edebîyata Kurdî ya di serdema mîrektîyan de jî li ser bingeha van medreseyan hêşîn bû û teşe girt.

Di dirêjahîya demê re li ser vê binaxeyê, xasma di serdema mîrektîyên Kurdan de, berhemên edebî yên Kurdî ku karibin bi edebîyatên gelên cînar re pêşbazîyeke serkeftî pêk bînin, zêde bûn (Kopî, 2013: 10). Bi vî awayî van medreseyên Kurdan wek sazî û dezgehekî xwendin û perwerde bi zimanê Kurdî ji sê hêlan ve roleke dîrokî hildane ser milên xwe. Yanî medreseyên Kurdan bi sê hêlan ve bi izmanê Kurdî re têkildar e. Yek: van sazîyan ji serê serdema îslamê de wek avahîyên perwerde bi Kurdî xizmet kirine. Ya duduyan: wek madena edebîyata

Kurdî ya klasîk dayîktî kirine. Ya sisêyan: bûne çavkanî ji pirtûkên dersê yên bi zimanê Kurdî re.

1.4. Pirtûkên Dersê yên Bi Kurdî Di Medreseyên Kurdî de

Pirtûkên dersê yên ku di medreseyên Kurdan hatine xwendin û wek "kitêbên rêzê" hatine bikaranîn, du cure ne: Yek, pirtûkên dersê yên eslî. Yên duduyan: Pirtûkên dersê yên alîkar. Pirtûkên dersê yên eslî, wek pirtûkên dersê ku xwendina wan mecbûrî dihatin qebûlkirin. Lê yên alîkar, ne mecbûrî bûn, wek lîteratûta niha, meriv dikare bêje "hilbijêrî" yan jî "pirtûkên alîkar".

Pirtûkên dersê yên ku ji medreseyan derketin û bi Kurdî hatin nivîsandin, ketin nav kitêbên rêzê û wekî pirtûkên dersê hatin bikaranîn. Abdurrahman Adak di lêkolîna xwe ya girîng a di vê derbarê de her du cureyên van pirtûkan wekî "Pirtûkên Mufredatê yên Sereke" û "Pirtûkên Mufredatê yên Talî" bi nav dike. Her wiha van agahîyan dide:

"Di çarçoveya agahîyên di dest de, pirtûka pêşîn a ku bi Kurdî hatîye nivîsandin û di medreseyên Kurdan de wekî pirtûka dersê hatîye xwendin, "Tesrîfa Kurmancî" (Serfa Kurdî) ya Elîyê Teremaxî ye ku di dawîya sedsala XVIem de li devera Miksê hatîye nivîsandin. Elîyê Teremaxî, di vê berhema xwe de ji mijarên rêzimanê li ser morfoloîyê rawestîyaye û morfolojîya Erebî, farisî û Kurdî berhev kirine. Ev berhema Teremaxî, hem ji ber ku pexşan e, hem jî ji ber ku cara yekem hinek mijarên rêzimana Kurdî di xwe de hewandine, di dîroka perwerdeya bi zimanê Kurdî de zehf giring e. Piştî Teremaxî bi sed-sed û pêncî salî vê carê Mela Yûnisê Helqetînî ku ew jî ji devera Miksê ye, bi Kurdî du berhemên pexşan nivîsandin. Navê yekê "Zurûf", navê ya dî jî "Terkîb" e. Ev her du berhem jî bi Kurdî ne û di derheqê sentaks/hevoksazîya zimanê Erebî de ne û di medreseyan de wekî pirtûkên dersê hatine xwendin. Di sedsala XVIIem de Ehmedê Xanî, du berhemên menzûm wekî pirtûkên mufredata medreseyê nivîsandin. Yek ji van "Nûbihara Biçûkan" e ku ferhengeke menzûm a bi Kurdî-Erebî û Erebî-Kurdî ye û ya dî jî "Eqîdeya Îmanê" ye ku derheqê esasên bawerîya dînê îslamê de ye. Di sedsala XVIIIem de Melayê Bateyî mewlûdek û di sedsala XIXem de jî Mela Xelîlê Sêrtî "Nehcu'l-Enam" nivîsand. Herweha berhemeke pexşan ku nivîskarê wê nayê zanîn, heta vê dawîyê jî di tevahîya medreseyên Kurdan de hatîye xwendin ku navê wê jî "Eqîdeya Îmanê" ye". Pirtûkên Mufredatê yên Talî: Di vê serdemê de derveyî

pirtûkên mufredatê yên sereke, gelek pirtûkên dî jî bi Kurdî hatine nivîsandin. Dikare bê gotin ku tevahîya van pirtûkan edebî ne û bi nezmê hatine nivîsandin. Ev cureyên pirtûkan di murfedata perwerdeya medreseyê de rasterast nehatine bikaranîn, lêbelê ji alîyê derçûyên medreseyan ve hatine nivîsandin û ji alîyê seyda û xwendkarên medreseyan ve hatine xwendin. Wate ev pirtûk di medreseyan de hatine bikaranîn. Loma ev pirtûk jî di pileya duyem de wekî materyalên perwerdeya bi zimanê Kurdî dikarin bên hesibandin. Dîwana Melayê Cizîrî, Mem û Zîna Ehmedê Xanî, helbestên Feqîyê Teyran û gelek berhemên dî di vî warî de wekî mînak dikarin bên dayîn (Adak, 2014: 98).

Ev pirtûkên dersê yên Kurdî hemû bi Kurdîya Kurmancî ne û di serdema mîrektîyan de hatine nivîsîn. Her wisa bênavber di medreseyên Kurdan de wek pirtûkên dersê hatine xwendin. Mela Mehmûdê Bazîdî di sedsala XIXan de derbarê pênc heban de agahî daye. Ew pênc pirtûkên dersê ev in: “Tesrîfa Kurmancî”, “Nûbihara Biçûkan”, “Mewlûd”, “Zurûf” û “Terkîb”. Her wisa gotîye ku ev berhem di medreseyên Kurdistanê de tên xwendin (Bazîdî, 2010: 18).

Ji van agahîyan derdikeve holê ku bi tevahî herî kêm deh-diwanzdeh pirtûkên Kurdî yên ku di medreseyan de wek pirtûkên dersê hatine xwendin, hene. Pirtûkên rêzê yên bi Erebî û Kurdî ku di medreseyan de têtin xwendin, teqrîben sî heb in. Her çiqas ev hejmar li her derê eynî nîne. Lê bi gelemperî di navbra bîst û çilî de diguhere (Yüksel, 1995: 102). Kifşe dibe ku ji sê paran pareke pirtûkên dersê yên medreseyên Kurdan, bi zimanê Kurdî hatine nivîsîn. Ev jî ceribîneke girîng a dîrokî ye ji bo perwerde bi zimanê Kurdî û bo pirtûkên Kurdî yên dersê û mufredatê.

Ehmedê Xanî, bi berhemên xwe û bi mijarên ku di nava berhemên xwe de hûnandîye gelek bala mirovan kişandîye ser xwe. Mem û Zîn, Eqîdeya Îmanê û Nûbihara Biçûkan berhemên wî ne. Di nava van berheman de yê ku ji bo xwendekarên medreseyê nivîsandîye Eqîdeya Îmanê û Nûbihara Biçûkan e. Yekem ferhenga (Kurdî-Erebî, Erebî-Kurdî) bi zimanê Kurdî hatîye nivîsîn Nûbihara Biçûkan e, bi mebesta ku zarok bi Kurdî hînê Erebî bibin hatîye nivîsîn. Em ji agahîyên Mele Mehmûdê Bazidî fêm dikin ku birastî jî Nûbihara Biçûkan di medreseyên Kurdistanê de wekî kitebeke derse hatîye xwendin (Adak, 2015: 254).

Cihê berhema Ehmedê Xanî Nûbihara Biçûkan di perwerdeya Kurdî de gelekî giring e. Ehmedê Xanî armanca xwe ya nivîsandina ferhenga Nûbihara

Biçûkan wekî alîkarîya zarokan ji bo hînbûna Quranê bi şêwazeke xwerû û hêsan destnîşan kirîye ku di vê rîyê de zehmetîyan nekişînin. Xanî, bi vî karê ku kirîye xwestîye rê li ber zarokê Kurdan vebike ku xwe di warê îlm û zanînê de pêş ve bibin.

1.5. Perwerdeya Bi Kurdî Di Serdema Modern û Rewşa Îroyîn de

Her miletek xwedî ziman, çand, folklor û edebîyatekî ye. Ev xîmên giring taybetîyên milletan dide destê meriv. Tevî ku em behsa giringîya ziman dikin helbet divê pê re em behsa edebîyat û perwerdeyê jî bikin. Tevger û hereketên sîyasîyên li ser rûyê dinyayê qewimîne, berê mirovan daye ser meseleyên nû. Şerê Cîhanê yê Yekem û Duyem gelek guherîn li ser rûyê dinê pêk anî ye. Her miletek nesîbê xwe ji van şer û bûyeran girtine. Sedsalên 19 û 20an xwedî giringîyeke mezin a dîrokî, aborî û sîyasî ne. Miletê Kurd jî di van sedsalan de berê xwe daye ser xebatên edebî û sîyasî.

Xebatên sîyasî, çandî û tevgerên ji bo zimanê Kurdî di van salan de xurttir bûne. Îcatkirina matbaayê û pê re geşbûna çapxaneyan karê miletan hêsan kir. Bi vê sayê miletan dev jî xettatîyê berda û derbasê nivîsên maatbayê bûn. Bi vê yekê re hejmara berhemên wek rojname, kovar û pirtûkan zêde bûn. Ev tevger û fikrên nû miletê bi ser xwe ve vedigerîne. Bi gotineke din her miletek dikeve derdê xwe û hewl dide ji bo ziman û milet xwe. Ji bo ku pêşî li ber wendabûna berhemên xwe bigrin xebatên ziman û edebîyatê derbasê nav rûpelên pirtûkan dikirin. Di vê çarçoveyê de ji alîyê kesên Kurdewar ve gelek xebat û xizmetên bêsînor hatine kirin. Ji ber ku mesele zêde belav nebe em ê tenê behsa çend xebatên Celadet Alî Bedirxan bikin.

Celadet Alî Bedirxan yek ji nûner û xebatkarên zimanê Kurdî ye. Helbet malbata Bedirxanîyan tev di vê warê de zehmetî kişandine. Di nava salên zor û zehmet e gelek ked dane miletê Kurd û zimanê Kurdî. Feqet îro dema ku behsa bikaranîna alfebaya Latînî ji bo nivîsandina zimanê Kurdî bête kirin, pêşîyê Celadet Bedirxan tête bîra me. Bêguman di pêkanîna şiklê dawî û tetbîqkirina vê alfebeyê de para Celadet Bedirxan û ekola Hawarê gelek zêde ye. Lêbelê di kudandina vê rê de keda gelek mirovên berîya vê jî hene, divê ev jî bîne bi bîrxistin û ev encam, wek pêvajoyeke gehiştî û kolektif bête dîtin. Lewra li ser vê babetê nêrînên cihê cihê hene (Veroj, 2018, s. 80).

Celadet, di warê standardize kirina ziman de gelek xebat kirîye û xwe li ser vê meseleyê xwe êşandîye. Mîr Celadet Bedirxan hê 13 sal berîya weşandina kovara Hawarê, ser tîpên Latînî xebitîye. Celadet tevî van xebatên xwe hêdî hêdî bingehek ji bo zimanê Kurdî ava kir û alfebeya Kurdîya ya bi tîpên Erebî bi saya kovara Hawarê wergerand ser tîpên Latînî. Kovara Hawarê yek car ji tîpên Erebî dûr neket heta hejmara 24an weşana xwe bi her du zimanan berdewam kir. Mîr Celadet Bedirxan, di hejmara ewil ya Hawarê de, elfabeya Kurdî ya latinî bi xwendevanan dide nasandin. Ew wek mamostayekî ku xwendevanên xwe ji nû ve fêrî xwendinê bike, bi awayekî zanistî elfabeya nû, di 15 hejmarên Hawarê de dide naskirin. Sebeba çêkirina her tîpekî yan jî guherandineke nû, bi zanistî zelal dike, bi zimanên din ve dide ber hevudû û bi xwendevanan dide zanîn. Celadet di hejmarên ewil de hêdî hêdî tîpîn alfebeya Latînî bi xwendewanan dida nasîn (Çetin, 2016:116).

Elfabeya Kurdî di kovara Hawarê de ji hejmara 30î şûnda êdî wek elfabeya ku em îro bikartînîn bi temamî hate nivîsandin. Elfabeya îro bi saya Celadet Alî Bedirxan û rêhevalên wî pê gelek xebat û çalakî tête kirinê. Her çiqas hin pirgirêkên rêzimanî hê jî di nava gel de hebe êdî ew elfabeya ji alîyê gel ve hatîye pejirandin. Elfabeya ji bo perwerde ya zimanê Kurdî tê bikaranîn elfabeya Kurdî ya Latînî ye. Îro li dibistan û zanîngehan bi vê elfabeyê zarok hînê zimanê Kurdî dibin.

Zimanê Kurdî ji ber ku xwedî gelek zarava û devokan e hin caran di standartîzîsyonê de û di perwerdeya zimanê Kurdî de pirsgirêkên rêzimanî derdikeve holê. Piranîya Kurdan, Kurmancî wekî zimanê xwe yê zikmakî û yê mîrate (heritage language) qebûl dikin. Ev Kurd li Tirkîyeyê (teqrîben 10 heta 15 milyon), li Sûrîyê (teqrîben 2 milyon), li Iraqê (1 hata 1.5 milyon) û li Îranê (teqrîben milyonek) û li Ermenîstan û welatên derûdora wê (teqrîben 500,000 heta 1 milyon) dijîn. Hin bajarên mezin yên ku li wan Kurmancî dihê axaftin ev in: Dîyarbekir (Amed bi Kurdî) li Tirkîyeyê, Duhok li Iraqê, Qamişlo li Surîyê û Urmîye (Wirmê) li Iranê. 500,000 axêverên vî zaravayî li Emerîkaya Başûr û Ewrupayê, bi taybetî jî Almanyayê dijîn (Sheyholîslamî, 2020: 86). Gava em li van agahîyan dinêrin em hêsanî dikarin bibêjin ku encax ji bo standartbûna zimanê Kurdî avahîyeke fermî ya ziman ji bo Kurdan hebe ku ji bo serîya tevan kanibin zimaneke fermî û standart ji bo zimanê Kurdî bête dîyarkirin.

Ji destpêka sedsala 20an heta niha ji xebatên folklorîk û çandî heta xebatên rêzimanî wekî pêlikên biçûk bin jî, heta van demên dawî ji Kurdan re bûne dewsên ku dikarin bên şopandin û pê rê bê dîtin. Herwiha bûne arşîv ku em bi van xebatên çend dehsalên dawîn lê zêde dikin. Van salên dawîn ku bi taybetî jî li Tirkîyeyê, bi pêşveçûnên sîyasî û aborî ve girêdayî rewşa Kurdan û ya zimanê Kurdî hat merheleyek nû. Ji înkara nav û nasnameya Kurdan rewş hat gihîşt naskirina Kurdan û zimanê wan. Heta niha Kurdên ku enerjîya xwe di hewla îsbatkirina nasname xwe de xerc dikirin, êdî ji naskirina wan şûnde dikarin vê enerjîya xwe di xebatên çandî û zimanî de xerc bikin. Herçiqas ev naskirina ziman û nasnavê Kurdî ne fermî be jî, îlana rewşa meşrû ye ku dûre dê bi fermî naskirinê bi xwe re bîne. (Ertekin, 2015: 30)

Asîmîlasyon û tunekirina zimanê Kurdî li Tirkîyeyê bi tundî hatîye meşandin. Zimanê Kurdî tevî van astengîyan berxwedaye. Şehmus Kurt, di xebata xwe de cih daye banên ku li zimanê Kurdî xwedî derketine; Navenda Çanda Mezopotamyayê tê, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Enstîtuya Kurdî ya Amedê, kursên taybet yên Kurdî, TZP Kurdî û Kurdî Der, Komele û Sendîka, Eğitim Sen, Nûbihar, Zanîngehên Dewletê û Enstîtuyên Zimanên Zindî li Tirkîyeyê, Zanîngehên Weqfê. (Kurt, 2020:118-147)

Em dikarin bibêjin ku bi guherîna hin bûyerên sîyasî re êdî meseleya Kurdan û zimanê Kurdî di qadan de cihê xwe girtîye kêm zêde bûye xwedî statuyekî. Di van salên dawî de ne bi temamî be jî hin qedexe û astengîyên li ber zimanê Kurdî rabûne. Piştî guhertina di qanûna pêwendîdar de di sala 2012 de, Wezareta Perwerde Kurdî (Kurmancî û Zazakî) bi giştînameya dersên hilbijartî ku ji hêla di bin navê "Zimanên herêmî yên ku welatîyên Tirkîyeyê di jîyana xwe ya rojane de bi kar tînin" wek Dersa Ziman a Hilbijartinê li dibistanên amadeyî yên giştî hefteyê du saetan dest bi hînkirinê kir. (Kurt, 2020: 14)

Li Tirkîyeyê bi vekirina kenala TRT 6ê û bi vekirina beşên Kurdolojîyê re zimanê Kurdî şûna xwe di nava meseleyê rojevê de qewî kir. Piştî nasîna fermî a zimanê Kurdî ji beşên Kurdolojîyê mamosyetên ziman û edebîyata Kurdî derçûn. Niha li Tirkîyê ji alîyê dewletê ve heftê de du saet dersên Kurdî yên hilbijartinê li dibistanên navîn de têne dayinê. Her çiqas ev yeka bi rêk û pêk neyê kirinê jî rastîyeke wisa ji bo zimanê Kurdî heye. Ev yeka bi xwe re meseleyên mufredata

dersên Kurdî jî tîne. Ji bo van dersê Kurdî ya hilbijartî ji alîyê MEBê ve pirtûkên dersê hatine çapkirinê. Naverok û bingeha van pirtûkan çiqasî têra vê karê dike an jî nake cihê gengeşîyê ye.

Ji salên 60 bigire heta îro perwerdeya zimanê Kurdî zêdetir li ser pirtûkên rêziman hatîye hînkirin. Lewra wekî din pirtûkên perwerdeyê zêde li ber destan tune ye. Bi van derfetên kêm zimanek ji alîyê perwerdeyê we çiqas Karibe bi serkeve û armanca xwe pêk bîne. Dema em li Tirkîyeyê dinêhêrin pêvajoya hînkirina zimanê Kurdî ji hînkirina rêziman wêdetir nîne. Heta sala 2001î hînkirina zimanê Kurdî wisa berdewam kirîye. Vê pêvajoyê rê li ber geşedana zimanê Kurdî girt û bandoreke neyênî li ser motivasyon û helwestê xwendekaran çêkir. (Kurt, 2020: 197)

Hewce dike ji bo perwerdeya zimanê Kurdî kesên pispor û zana, li gel hev bicivin û ji bo perwerdeya Kurdî bi awayekî rêk û pêk ji bo dersên Kurdî bernameyeke baş amade bikin. Dersa Kurdî wek derseke hilbijartî tê dayinê divê pirtûk, amûr û rê û rêbazên ji bo vê dersê tê bikaranîn ji alîyê mamosteyan û kesên bi perwerdeya Kurdî re eleqedar dibin her dem bête guncav kirin. Divê bingeheke xweş ji bo pêşerojê amade bibe da ku gava dersê Kurdî wek dersên sereke li dibistanan bête dayin ev tevlihevîyana ji holê rabûbe. Peyre divê mufredateke, amûr û alavên bi rêk û pêk ji bo dersdayina zimanê Kurdî amade bibe. Perwerdeya hezar sal berê li medreseyan dihat dayinê îro tevî amûrên teknolojîk li dibistan û zanîngehan tê dayinê. Divê êdî li gor şert û mercên vê serdemê dersên Kurdî xîtabê xwendekarên xwe bike. Ev xebata me jî bi vê armancê hatîye amadekirin, dibe ku vê valahîyê gişkî danegire lêbelê ew ê bibe kevirek ji bo xurtkirina perwerdeya zimanê Kurdî.

2. ZİMAN

Di dîroka mirovahîyê de, mirov tev bi hev re di nava têkilîyekê de jîyane. Ji ber vê yekê jî civakên ji hevdu curbicur derketine holê. Ji bo ku mirov kanibin bi hev re bijîn divê hin taybetîyê wan ên wek hev hebe. Ziman, çand, xwarin, lixwekirin hin ji wan taybetmendîyan e. Ev taybetmendîyana bi têkilîya mirovan re çê dibe. Têkilîya miletekî bi van taybetmendîyan xurttir dibe. Ziman amûra herî giring ya di navbera mirovan de ye. Di vê çarçoveyê de em ê li ser giringîya ziman bisekinin.

Di derheqê ziman de gelek têgeh û vegotin hene. Ziman, hebûna kesayetan e, ev kes bi wê hebûna xwe ve têkilîyê bi mirovan re datîne (Çağlayan, 2014:42). Çawa ku kenê meriv, hal û tevgerên meriv wek parçeyên hebûnêye û me nişan dide, ziman jî bi vê awayê hebûna meriv nişan dide. Ziman alîkarîyê dide ku, em kanibin tiştên di nava hişê xwe de vebêjin û peyre hest û ramanên xwe bînin ser ziman. Bi aweyekî din em dikarin bibêjin ku ziman, hebûn û heyîna me ya veşartîye ku em bi kesên derdora xwe re parve dikin.

Biwê newê meriv nikarin vê pirsê ji guhên xwe bavêje gelo di cîhanê de yekem ziman kîjan e? Ev pirsa jî bi xwe re bûyera Herodot tîne bîra meriv. Herodot, Berîya Zayînê (484-425) an de ji bo ku bizanibe ka zimanê cîhanê yê yekem kîjane ceribînek kirîye. Berîya Zayînê Qralê Misirê Psammetikos du zarokên ku nû Xwedê daye, bêyî ku kesek bi wan re xeber bide, dike hewşekî. Kesê ku bi wan re eleqedar dibe qet bi wan re xeber nade. Piştî du salan ji devê zarokan peyva *bekos* dibîhîzin. Ev peyv di zimanê Fîrgyan de tê wateya nan (Herodotos, 2021: 118). Di hin çavkanîyan de derbarê vê bûyerê de hin tiştên din tê gotinê. Yanê derbarê meseleya ziman û destpêka ziman de ne pêkan e ku meriv teqez agahîyekî bidin. Helbet ser û binê vê mijarê jî tune ye. Tişta ji alîyê herkesî û her miletekî ve tê qebûlkirin giringîya ziman ya di jîyana mirovan de ye. ji ber ku her mirov çavê xwe di nava cîhaneke ku ziman lê ye vedike. Bi wê zimanê re mezin dibe û hînê jîyanê dibe.

Ziman amûreke ragihandinê ye, meriv berze dike û bi rûmettir dike. Ziman tenê ji bo têkilîyê nayê bikaranîn, ziman di heman demê de behre û qabîlîyeta zarokan dide kifş kirin. Tevgera fikirinî wekî meriv xwe bi xwe re xeber bidin. Hin caran gava meriv li ser bûyeran difikirin an jî ji bo pirsgirêyekî li çareserîyê digerin meriv wê gavê bi xwe re yanê di hindurê xwe de xeber dide. Di navbera hiş û ziman de têkilîyeke xurt heye.

Ziman, di wateya berfireh a vê peyvê de, navgînên ku bi wan ezmûnên hestî, hestyarî û dilxwazî yên kesane têne vegotin û gihandina kesên din vedihewîne. Ji bo vê armancê tevgerên deng, dest û laş dikarin werin bikar anîn, bi rêzê ve bandorên bihîstî, taktil û dîtbarî ragihînin (Boas, Dil, 2021: 1007). Ziman jî bi qasê dîrokçeya mirovan kevin û dûr e. Li gor Aksan, ziman amûreke bi heyîna mirovan re geş dibe û bi saya wê haya me ji pêşeroj û rabirdûya mirovan çêdibe

(Aksan,1998). Yanê bi gotineke din em dikarin bibêjin ku ziman dîroka mirovan e. Hiş û rabirdûya mirovan e.

Roja ku mirovan çavê xwe li ser rûyê dinyayê vekirîye hînbûna wan ya li ser tiştan dest pê kirîye. Ev hînbûn hin caran bi tevgeran, hin caran bi çavan, hin caran bi bihîstin, hin caran bi lîstikan çêbûye. Zimanê ku di nava laşê me da erkeke wê ya giring heye, pir caran karê me hêsan dike. Bi saya ziman mirov dikare xwe îfade bike. Mirov bi kesên derdora xwe re her gav dixwaze di nava têkilîyê de be. Têkilîya di navbera mirovan de herî zêde bi saya ziman çêdibe. Gelek cureyên têkilîyan hene, bêguman ziman alava herî xurt û ya herî bi bandor e. Ziman ewqas giring e ku mirovan ji bo hînkirin û hînbûna zimanan gelek rê û rêbaz ceribandine. Rêbaza dramaya dahêner yek ji van rêbazan e. Helbet ev rêbaz ne tenê ji bo hînkirina zimanan e. Ji bo gelek beşên din jî tê bikaranîn, lê di hînkirina zimanan de jî ev rêbaz gelekî bi kêrê meriv tê.

2.1. Zimanê Zikmakî

Zimanê zikmakî ev tişta ku mirov bêyî hewldanekî û bê zehmet hîn dibe ew e. Zarok bi van amûrên çandî (zimanê zikmakî) xwe nas dike û xwe pêş ve dibe. Xwedê mirov di proseseke wisa de afirandîye ku hêj di zikê dayika xwe de bêyî ku hiş û hestên wan bixebite hînê tiştinan dibe. Piştre meriv têne ser rûyê dinyayê û dikevin nava geşedaneke bê ser û binî. Ji geşedana fîzîkî bigirin heta geşedana hişî, ji geşedana zimanî bigirin heta geşedana psîkolojîk gelek qonaxan re derbas dibe. Li gor gelek zanist û pisporan di jîyana mirovan de qonaxa herî giring zarokatîye. Lewra zarokatî bingeha jîyana mirovan e.

Zimanê zikmakî herî ewil ji dê û bav, ji malbatê û ji derdorê malbatê tête hînkirin û piştre ji bo mirovan dibe amûra têkilîyê ya herî xurt bi civakê. Pisporên vê qadê, vê mijarê di parzûnan re derbas dike beş bi beş ji hevdu vediqetîne. Ziman û hînbûna zimanan jî yek ji wan pirsên ku di nava geşedana mirovan de ye. Gava zarok tê dinyayê dê û bavê wan û kesên li derdora wan bi zimanekî li zarok nêzik dibin û pê re têkilîyê datînin. Zarok him bi bîhîstina dengan û him jî amûr û alavên derdorê xwe re fêrî zimanê têkilîyê dibe. Zimanê ku zarok bêyî destûra xwe ji dê û bavê xwe hîndibe zimanê zikmakî ye. Ziman wek zindîyan li gor dem û serdemê her wekî din li gor çand û kelepora di nav de ye dirûv digire. Ji ber ku ziman nasnameya mirovan e, mirov jî ji vê yekê para xwe digire.

Aksan, zimanê zikmakî yek ji hêmanên sereke ye ku neteweyekê dike netewe û ferdên wî miletî bi hev ve girêdide, bikaranîna zimanê zikmakî endamên civakê li hevdu kom dike û rê li ber nêrîneke hevpar ya gerdûnî vedike. Di pêvajoya perwerdeyê de çand tê bidestxistin. Amûra herî girîng û belkî tekane ji bo destxistina çandê jî ziman e, zimanê zikmakî ye. Perwerdeya zimanê zikmakî tenê ji bo amûreke ragihandinê nîn e, ji bo ku kesên di nava malbatê û civakê de bê famkirin girîng e (Çelebi, 2006:299).

Li gor Lyons, Mirov bixwaze-nexwaze zimanê zikmakî bi awayekî navxweyî an jî bi saya hêmanên derveyî hîndibe û gava hînbû şunda mirov xwe bi çand û kelepora wê civakê digre. Çawa ku mirov bixwaze an jî nexwaze hînê zimanê zikmakî dibe bi heman awayê mirov bixwaze nexwaze xwe bi civaka xwe ve jî digire (Ece Yapılcan, 2022: 12).

Korkmaz (1992), zimanê zikmakî, zimanê mirov ji malbata ku tê de ji dayik bûye û mezin bûye û ji derdora civakî ya ku pê re girêdayî ye hîn dibe, di bin hişê xwe de diçe û di têkilîyên mirov û civakê de girêdana herî xurt çêdike (Ece Yapılcan, s.11). Mirov xûy û xasetên xwe gişî bi zimanê xwe yê zikmakî re hîn dibe. Çand û kelepora mirov di nav de ne ji ber vê yekê giring e. Lewra ev yeka peyre nasnameya mirovan ya kesayetî û çandî dîyar dike.

Zimanê zikmakî gava pêşve neçe û li ser xebat neyê kirinê di cihê xwe de bêyî tevger û pêşveçûyin wek xwe dimîne. Kesên ku bi vê zimanê xitimî re mezin dibin, nikarin xwe bi rihetî îfade bikin. Di encama vê yekê de jî zarokên ziman xitimî ew ê mezin bibin û di nava civatan de cihê xwe bigirin. Ev yeka jî dibe sedema paşveçûyina miletan. Ji bo ku zarok bi hişmendî û famberî hînê zimanê xwe bibin berîya her zimanekî divê bi zimanê zikmakî perwerde yê bibînin. Miletek encax bi zimanê zikmakî yên zarokên xwe Karibe hişekî lêkolîner, afirîner û hişekî rexneyî peyda bike.

Zimanê ku malbat pê xeber dide li ser zimanê zarokan bandorê çêdike û asta zimanê zarokan dîyar dike. Zarok di temenê xwe yê piçûk de zimanê zikmakî bê hişmendî hîn dibe. Gava ev rewş wîsa dibe zarok rêzimana zimanan jî bêyî hişmedî hîn dibe. Heke bêyî rêz û rêbazan ziman bête hînkirin gava zarok hînê zimanekî din dibe rêbaz û rêzimana ziman tevlihev dibe. Ev pirsgirêka bi xwe re çareserîyeke weke perwerdeya zimanê zikmakî tîne.

Giringîya perwerdeya zimanê zikmakî Emîn Ozdemir wisa rêz dike:

1. Gerdûna zimanî ya zarokan wê bibe destpêka hînkirina zimanê zikmakî. Gerdûna zimanî ya zarok bi hawîrdor, berjewendî û hewcedarîyên wî ve sînorkirî ye. Ev sînor wê gav bi gav di qonaxên cuda yên perwerdeyê de pêş bikeve.

2. Çalakîyên zimanî di nav tevneke pêwendîyan de tevahîyekî pêk tîne: axaftin guhdarî kirinê, guhdarîkirin têgihîştinê û têgihîştin hewce dike ku bibe peyv an nivîsandin. Tora têkilîyên di navbera çalakîyan de, herikîna dersan û divê guherbarîyê çêbike.

3. Dersa zimanê zikmakî ne derseke zanînê ye, derseke jêhatî û adetan e. Ji bo damezrandina adet û bidestxistina jêhatîbûnê hewcedarî bi kirin û sepandinê ye.

4. Dersa zimanê zikmakî derseke adet û jêhatîbûnê ye û herwiha derseke avakirin û geşkirina kesayetîya mirov e. Nivîsarên ku dê di vê qursê de bêne lêkolîn kirin ev in: lêkolînên li ser wê dê di pêkhatina kesayetîyê de roleke girîng bilîze. Ji bo bidestxistina hişmendî û coşa neteweyî, ji bo têgihîştina têkilîya sedem û encama bûyeran, pêşxistina hêza dadwerîyê bi dîtina di vê çarçovê de, bicîkirina nirxdana ziman bi nivîsên xweş, xeyalkirin bi çalakîyên nivîsandin û xwendinê. Divê ev nîvîsana tevî van xîman bête xwendin û armanc kirin ku hêza metnê têr bike û bi bandor rave bike.

5. Dersa zimanê zikmakî hem armanc û hem jî derseke amûr e. Di vê çarçoveyê de her ders heta radeyekê dersa zimanê zikmakî ye û her mamoste, mamosteyek zimanê zikmakî ye (Çelebi, 2006: 301).

2.2. Perwerdeya Zimanan

Zarok, hem bi saya derdorê xwe û hem jî bi saya dubarekirin û teqlîdan hînê ziman dibe. Li ser rûyê dinyayê li ku derê dibe bila bibe zarok cara ewil bi axaftinê piştre jî bi nivîsandibê hînê tiştinan bûye. Gelek zimanzan hinbûna zarokan di vê çarçoveyê de dinirxîni. Her ziman li gor xwe rê û rêzikên wê hene, ji ber vê divê meriv li gor tu zimanê, zimanekî nepîvin û rexne nekin. (el-ARABi, 1999)

Krashen dibêje ku ji bo bidestxistina ziman hemû şert û merc kâmil bin jî, ziman têra xwe nake. Lewra divê kesê ku hînê zimanekî bibe bi peyamên watedar û bi gotinên watedar guhdarîya wî zimanê kiribe. Divê di nava hînbûna zaman de pêvajoya bêdengîyê jî hebe ku ew kesê ku hînê ziman dibe, di nava wê bêdengîyê

de Karibe guhdarîya wî zimanê bike, wate û maneya peyamên wî zimanê têbigihêje (Uçak, 2016:67).

Hînbûna zimanan hin caran bêyê ku haya meriv jê hebe pêk tê. Ev yeka jî bi rê ya nava civakê pêk tê. Tu zimanek ji zimanekî çêtir nîne bes hin millet zêdetir li ser zimanê xwe xebitîye û pêşve birîye. Divê ev xebat ewil ji zimanê zikmakî ve bête destpêkirin. Tenê bi awayê teqlîdî na, divê li gor rê û rêbazan bête hînkirin. Li gor zagona MEBê divê zarok li gor van rêzikan hînê ziman bibin:

1. Li gor qabilîyetên guhdarî kirin, temaşe kirin axaftin û nivîsandinê hînê ziman bibe.
2. Divê axaftin û nivîsandin li gor rêzimana ziman be û bi hişmendî bê hînkirin.
3. Divê zarok bi hînkirina ziman re ji xwendina xwe fam bike, xeyal bike û pê bifikire.

Hînkirina zimanan bi gelemperî li ser xîmên wek, guhdarî kirin, axaftin, nivîsandin û xwendinê tê nîşandan. Helbet ev xîmana li gor serdema îroyîn têrê dike an nake cihê gengeşîyê ye. Di bingeha hînkirina ziman de divê zarok ji xwendina fam bike û Karibe wê fama xwe rawe û şîrove bike. Xîmên wek xwendin, axaftin, guhdarî kirin û nivîsandinê bi hevdu re têkildarin. Wek xelqeyên zincîrî bi hevdu ve girêdayîne.

2.1.1. Guhdarîkirin

Gava zarok Xwedê didin dest bigirî dikin, çawa ku dengan dibîhîzin disekin û dest bi guhdarîkirinê dikin. Yanê guhdarî kirin ev qabilîyeta yekem e ku di warê hînbûnê de. Çalakîya gundarîkirinê tenê nayê wateya bihîstina dengên li derdor, di heman demê de çalakîyeke têkilîyê ye. Guhdarîkirin di bîhîstina dengan de çalakîyeke hişîye (Güneş, 2007).

Di nava têkilîya rojane ya mirovan de guhdarîkirin gelekî giring e. Bi çalakîya guhdarîkirinê têkilîya mirovan ya malbatî û hevaltîyê xurtir dike. Têkilîyeke xweş bi xwe re jîyaneke kêfxweş tîne. Mirov zimanê ku hînbûye bi saya guhdarîkirinê hîn bûye. Mirov gava têkilîyê datînin herî zêde rêya axaftinê hilbijêrin. Pisporan çalakîya guhdarîkirinê ji hev cuda kirine. Wekî guhdarîkirina bi

şopandina tekstan, guhdarîkirina rexneyî, guhdarîkirina pasîf, guhdarîkirina dahêner û hwd.

Di hînbûna zimanan de çalakîya guhdarî kirinê, ji bo ku mirov Karibe têkilîya di navbera sedem û encamê de hînbibe gelekî giring e. Bi vê sayê mirov dikare hêmanên sereke fam bike û şîrove bike. Ji bo vê yekê di qada perwerdeyê de divê giringîyê bidin çalakîya guhdarîkirinê.

2.1.2. Axaftin

Axaftin çalakîyeke sirûştî ye. Her zarok gava Xwedê dide bi girîyê xwe diaxive. Piştre herçî diçe ji alîyê fîzyolojîyê ve têdigihêje û îja dengan derdixe. Ev deng dibe peyv û piştre dibe hevok. Li gor TDKyê axaftin ew tişt e ku meriv di derheqê mijarekê de fikra xwe bîne ser ziman. Dibe ku derheqê mijarekî de meriv li gel kesekî xeber bide û xwe bide famkirin. Zimanê ku tu meriv dizane bi dengê wê zimanê meriv dikare biaxive.

Axaftin yek ji hêmanên mirovahîyê ye. ji bo ku meriv meqsed û merama di dilê xwe de bide famkirin divê meriv li gel kesan biaxive. Axaftin çalakîyeke giringe di vê serdemê de ji bo ku meriv Karibe xwe bide famkirin an jî kesên derdora xwe xwe fam bike divê axaftina meriv pêşketî be. Ev yek bi xwendin û nivîsandinê ve pêş dikeve.

Di perwerdeya zimanan de axaftin xwedî cihekî taybet e. Ji bo ku meriv meriv xwe bi axaftinê îfade bike. Di nava xîmên perwedehîyê de lêvegerandin teknîkeke giring e. Ji bo ku meriv Karibe hînbûna xwedekaran bipîve divê mijara ku famkirîye li meriv vegerîne, ev jî bi rêya axaftinê çêdibe.

2.1.3. Xwendin

Xwendin, qabîlîyeteke zimanan ne ku bi hînbûna perwerde û nivîsandina zimanan re pêk tê. Bi çalakîya xwendinê re mirov teksta ku dixwîne di hişê xwe de dinirxîne, şîrove dike û wisa fambûna mirovan bi xwendinê re pêk tê. Rêya ku di warê zanîn û zanistê de herî zêde serî lê tê dayin xwendin e (Göksel, 2022:135).

Xwendin, pêvajoyeke fîzîkî û hişî ye. Ji alîyê fîzîkî ve meriv bi çavan nivîsê dişopînin û çalakîya xwendinê dikin. Peyre ji alîyê hişî ve ev sembol û nivîsana digihêjin wateyekî. (Ece Yapılcan, 2022, s. 24) Mirov wan sembolan di parzûna hişê xwe de dadiwerivîne. Axaftineke herikbar bi saya xwendina zêde çêdibe.

Xwendin, derîyê hest û ramanan, fikirîn û tehlîlan vedike. Çalakîya xwendinê di warê perwerdeyê de hewl dide ku mirov ji xwendina xwe fam bike û Karibe xwendin xwe şîrove bike. Li gor zanistan mifayê xwendinê wiha ye:

-Xwendin, alîkarîya dike ji bo famkirina pirtûkên perwerdeyê

-Xwendin bi kêrî lêkolîneke baş tê.

- Xwendin, qabilîyeta rexneyî û şîroveyî li meriv zêde dike.

-Xwendin, ferhenga peyvan li hişê meriv zêde dike.

-Xwendin qabîlîyeta axaftin û nivîsandinê zêde dike.

-Xwendin, alîkarîya hînbûna rêzimana zimanan dike, hwd.

Mirov dikare gelek tiştinên din rêz bike. Çalakîya xwendinê li ser jîyana mirovan bandoreke xweş çêdike. Ji ber vê yekê di warê hînkirina ziman de gelek giringîyê didin çalakîya xwendinê.

2.1.4. Nivîsandin

Di warê perwerdeyê de xala dawîn nivîsandine. Sedema vê yeke jî nivîsandin bêyî qabilîyeta bihîstin û bîrbirîyê qabîlîyeta psîko-motorê jî dixwaze. (Temizyürek, Bulut, 2016:152)

Di dîroka mirovan de nivîsandin di cihekî gelekî giring de ye. Bi saya çalakîya nivîsandinê haya me ji dîroka mirovan çêdibe. Gelek qadên zanist û zanînê bi saya çalakîya nivîsandinê pêş dikeve. Gava em li serborîya zimanan dinihêrin em dibinin ku ziman cara ewil bi xêzkirina wêneyan li ser dîwarên şikeftan derketîye holê. Piştre mirovan di nava xwe de têkilîyên ku danîne xwestine bi sembolan îfade bikin. Di encama van bûyeran de alfabeya zimanan çêbûye. Bûyerên ku tene bi devkî tê gotinê hin caran tê jibîrkirin ji bo vê yeke çalakîya nivîsandin pêşî li ber vê yeke digre.

Mirov ji bo ku kanibin hestên xwe, fikir, daxwaz û xeyalên xwe vebêje û van gotinên xwe ji bo ku bigihêjîne nifşên din çalakîya nivîsandinê bikartîne. Nivîsandin jî weke axaftinê çalakîyeke zimanî ye ku di têkilîya navbera mirovan de. Ji bo ku kanibin xwe îfade bikin çalakîya nivîsandinê alîkarîyeke bîsînor dide meriv. Nivîsandin di heman demê de yek ji cureyên vegotinê ye. Bi saya çalakîya

nivîsandinê meriv dikarin xeletîyên ku li ser ziman tê kirinê tespît bikin. Di qada perwerdeyê de çalakîya nivîsandinê weke xîmeke bingehîn tê qebûl kirin.

2.1.5. Rêziman

Rêziman, rê û rêzikên zimana ne ku ji bo rastnivîsîn û xwendina ziman. Rêzimana her zimanekî li gor xwe taybetîyên wê hene. Zarok gava nû dest bi axaftinê dike bêyî ku haya wê ji rêzimanê hebe diaxive. Piştre bi alîkarîya perwerdeyê ev hişmendîya rêzimanî lê peyda dibe û herçî mezin dibe van rêzikan bi baldarî bikar tîne. Ji bo ku rêzimana her zimanekî cuda ye ev qada rêzimanan qadeke cuda ya zanistê tê çespandin.

Mebesta hînkirina rêzimanan ne ew e ku zarok kanibin biqasê xwe îfade bikin biaxifin. Esas mebesta rêziman ew e ku zarok hînê rê û rêbazên ziman bibin û bi axaftineke rêk û pêk derî li ber xirabûyina ziman bigirê. Di heman çarçoveyê de mebesta hînkirina rêziman di warê perwerdeyê de zarok kanibin bi kesên derdora xwe re têkilîyeke xurt dayinin. Rêziman ne tenê ji alîyê teorik ve bê hînkirin divê rêziman di nava jîyana mirovan de cih bigrê.

3. Çanda Piranî Di Hînbûna Zimanan de

Wateya çandê li gor mirovan û li gor serdeman cuda hatîye rave kirin. Çand nirxên miletekî ye, ji xwarin û vexwarinê bigirê heta lixwekirinê û şêwaza jîyana mirovan tev çanda wan li ber çavê meriv radixe. Ziman jî biwê newê cihê xwe di nava çanda miletan de digirê. Ji ber ku di navbera çand û ziman de hevkarîgerî heye û li ser hevdu bandorê çêdike. Meriv ne dikare ziman ji çandê dûr pê bigire ne jî çandê ji ziman dûr pê bigire. Bi gotineke din em dikarin bibêjin ku bi saya ziman çand dikeve dirûvê dengan û li ser zimanan digere, ziman jî bi saya çandê dikeve nava jîyan û tevgerên mirovan.

Bandora ziman wekî li ser her tiştekî zêde ye, li ser çandê jî gelekî zêde ye. Di warên wek dîrok, edebîyat, dîn, zanist de jî bandora ziman xwe dîyar dike. Têkilîya di navbera mirovan de û têkilîya di navbera civatan de bi ziman pêk tê û berdewam dike. tiştên ku di nava civatê de manewî û berbiçavî ye giştik di nava ziman de jî heye. Mîrata dîrokî û çandî encax bi saya ziman meriv Karibe ji bo nifşên nû veguhêzîne (Bakıner Çekin, Çalışkan, 2020:170).

Hin caran ji bo sedemên ku wek şer, koçberî, sîyasî û ticarî miletên ku zimanê wan, çanda wan û gelek tiştên din ji hevdu cuda ne û mecbûr dimînin li gel hev bijîn. Helbet di vê serdema ku dinya ketîye halê enternasyonal de rewşa pirzimanî bûye meseleyeke xwezayî. Li ser rûyê dinyayê giştik ne nivîskî be jî her miletek xwedî zimanekî ye. Gava mirov hînê zimanekî din dibe pê re hînê çand û kelepora wî zimanê jî dibe. Çanda pêşveçûyî meriv encax bi zimanekî pêşve çûyî dikare bi dest bixe. Nîşaneya nasnameya mirovan zimanê ku pê diaxive û dinivîsîne, di heman demê de nîşaneya nasnameya miletekî dîsa zimanê wê miletê ye (Yazoğlu, 2005:138).

Bi saya rehetîya ku ji hêla veguheztinê û ragihandinê ve tê peyda kirin û ji ber zêdebûna koçberîyê, çand her ku diçe bi hevdu re têkildar dibin. Pluralîzm prensîb û nirxek e ku di sedsala 20. de derketîye pêş. Welatên ku bala xwe didin pirdengîyê, polîtîkayên ku pirçandîbûnê wekî nirxek giring a civakên demokratîk dibînin, pejirandine (Ergin, 2022:1166).

Rewşa duzimanî ji hin alîyan ve bandarên erenî ji hin alîyan ve jî bandoreke neyînî çêdike. Jîyana duzimanî li ser jîyana mirovan gelek alîyên neyînî hene. Rewşa duzimanî li hin welatan ji ber sedemên polîtîk dertê. Ev rewşa dibe sedema bandoreke neyênî. Crystal David (2019), dibêje ku divê welatên li ser rûyê cîhanê ji vê rewşê re rêzê bigirin û di vî warî de xebatan bikin. (Çamcı, 2019: 212). Li gor van agahîyan em dikarin bibêjin ku rewşa pirzimanî û rewşa çanda piranî bi hevdu re girêdayî ye. Mirov çiqas kanibin hînê zimanan bibe ewqas dikanin dinyayê bi hêsanî nas bikin.

BEŞA DUYEM

DRAMAYA DAHÊNER

2.1. Dramaya Dahêner

Dramaya dahêner, bi rewşa *metaksis* ya jîyana rast û jîyana xeyalî ve girêdayî ye. Lîstika Metaksis bi rewşeke jixweberî û bi lîstika rolan ve girêdayî ye. Di heman demê de derketina rêya ku di navbera dinyaya xeyalî û dinyaya rast de bi çûyin hatina lîstikan ve girêdayî ye (Adıgüzel, 2022:73).

Dramaya dahêner çalakîyeke lîstinê ye; lîstina peyvekê, têgehekê, fikrekê an jî bûyerekê qewimîye, bi awayekî jixweberî an jî bi sûdgirtina teknîkên şanoyê û bi teknîkên dramayê ve girêdayî ye. Dramaya dahêner bi girêdayê teksteke nivîskî nîn e. Bi awayeke jixweberî, bi fikr û hestên resen ê kesên ku rol girtîye ve girêdayî ye.

Bi wateya xwe ya herî berfireh dramaya dahêner di derheqê mijarekî de sûd wergirtina ji ezmûn û serborîyên komekî, sêwirandina bi teknîkên jixweberî û rolgirtinê ye (Adıgüzel H. , 2006:23).

Dramaya dahêner çalakîyek e, di navbera komekî de tê lîstin. Endamên lîstikê li derdora fikrekî têne gel hev. Lîstik bi saya teknîkên wek jixweberî û rolgirtinê tê sêwirandin. Dramaya dahêner ji alîyê serokekî ve tê vehinartin. Dramaya dahêner hewl, helwest, qabîyetên ku di hundirê zarokan de ye bi rêya lîstikê derdixe holê. Ji ber ku lîstikeke jixweberî ye bi qasê qabîlîyeta zarok û xwendekaran geş dibe.

Xwendekarên ku beşdarê dramaya dahêner dibin qabîlîyetên xwe yên wek pirsîna pirsan, çareserkirina pirsgirêkan, dahênerî û pirsînê bikartînin. Di heman demê de dramaya dahêner ji ber ku bi komekî re tê lidarxistin qabîlîyetên xwendekaran li ser hevdu bandorê çê dike. Hînbûna li gel hevalan û hînbûna ji nava civakê jî bi awayekî xwezayî pêş dixe (Güven, 2009:33).

Her zarokek li gor xwe taybet e. Ji bo vê yeke jî her zarok şêweyekî wî ya hînbûnê heye. Dramaya dahêner rê li ber zarokan vedike ku pirsgirêkan li gor xwe çareser bike. Zarokên ku beşdarê dramaya dahêner dibin li gor wan şêweyên xwe tevdigere. Ev yeka jî ji bo mamosteyan dibe nexşeyek da ku bizanibin ka kîjan xwendekar bi kîjan qabilîyetên xwe pirsgirêkan çareser dikin.

Zarok jî bi qasê mezinan li dinyayê cih digirin û di nava jîyanê de xwedî rolekê ne. Yek ji erkên mamoste û perwerdekaran divê alîkarîya zarokan bikin û fama wan li hemberê bûyerên ku di nava jîyanê de diqewime zêde bikin. Vê yekê jî encax bi saya hêmanên ku di jîyana zarokan de cih digirê dikarin bi dest bixin. Jîyana zarokan bi lîstikê ve girêdayî ye û pir tiştan bi ser vê rêyê re hîn dibin. Gava rewş wisa be divê mamoste û perwedekar ji bo perwerdekirina zarokan vê rêyê bimeşin (San, 1989). Di pêvajoya hînbûn û hînkirina zarokan de divê zarok bixwe tev hestên xwe, xeyalên xwe, bi hêza fikrên xwe di nava vê pêvajoya hînbûnê de cih bigirin.

Di vê serdemê de navbera zarok û mezinan de tim navbeyneke wan ji hev cuda dike heye, lewma têkilîyên mirovan qels bûne. Li dibistana jî di navbera mamoste û xwendekaran de em dikarin bibêjin ku pirtûk hene. Hinkirineke yekalî heye ku ji alîyê mamosteyan ve tête dayîn. Ji ber vê yekê xwendekar bi temamî nikarin xwe îfade bikin û fikrên xwe rasterast bibêjin. Ev yeka jî dibe sedema xwe şunda kirina xwendekaran. Ji alîyê gelek kesên pispor û zana ve hatîye qanihkirin ku kesên beşdarê nav pêvajoya hînbûnê dibin bêhtir û xweştir hîndibin.

Divê mamoste û perwerdekar vê teknîka ku xwendekar beşdarê nava pêvajoya hînbûnê dike paşguh nexin û di nava teknîkên xwe de bikar bînin. Dramaya dahêner, di nava teknîkên ku xwendekaran beşdarê nav pêvajoya hînbûnê dike de bi ser ketîye. Xwendekar bi dramaya dahêner re beşdarê komê dibe. Her endamê komê xwedî erkekî û rolekî ye. Serokê dramayê di nava komê de erkan belav dike û xwendekar bi awayekî jixweberî, bi qabîlîyeta fikr, hest û xeyalên xwe, bi hevalên xwe yê di nava komê de têkilîyê datîne. Xwendekar raste rast bi fikrên xwe, bêyî ku kesek têkilî wî bibe bi awayekî jîndarî bixwe hînê tiştinan dibe.

Bi saya dramayê xwendekar hînê hevkarîgerîyê dibe. Wagner (1994), Ji bo têgeha hevkarîgerîyê dibêje; divê bûyerekî de herî kêm du bireser an jî du lêker hebe û di navbera wan de divê têkilî û çalaki hebe (Saykılı, 2019:93). Têkilîya mirovan bi hevdu re cîvakê rûmettir dike. Civakeke bi rûmet saya zarokên jêhatî û bi xwe bawer çêdibe. Zarokên bi tena serê xwe pirsgirikan çareser dikin bêhtir jixwebawer dibin. Bi vê sayê dikarin di nava civakê de xwe baştir îfade bikin.

Tevî van agahîyan em dikarin bibêjin ku dramaya dahêner tenê ji bo hînkirina dersekî an jî mijarekî alîkarîyê nake. Bikaranîna dramaya dahêner di

dersan de derî li ber qabîlîyet, hêz, fikr û xeyalên di nava hişê xwendekaran de vedike û têkilîya xwendekaran bi hevdu re xurt dike.

Dramaya dahêner tevî serborîyên endamên komê xwe guncav pê digre. Li gor encamekî û fikrekî bi awayekî sêwirandinê pêşdikeve. Têkilîya ku di nava dramaya dahêner de pêk tê, bandorê li ser endamên komê çêdike. Bi gotineke din endamên komê di nava lîstikê de serborîyên xwe bi hevdu re parve dikin. Adıgüzel, di pirtûka xwe ya bi navê 'Di *Perwerdeyê de Dramaya Dahêner*' de taybetîyên dramaya dahêner wisa rêz dike (Adıgüzel, 2022:82) :

1. Dramaya dahêner, çalakîyeke komê ye.
2. Dramaya dahêner xwe dispêre serborîyên endamên komê û li derdorê endamên komê diçe û tê.
3. Dramaya dahêner di çerçoveyeke sêwirandinê de dest pê dike, peyre bi awayê jixweberî û rol girtinê ve berdewan dike.
4. Xebatên dramaya dahêner di çarçoveya dema niha û li vir de pêk tê.
5. Drama dahêner ji alîye kesên perwedekarê dramayê an jî ji alîyên mamosteyên di warê dramaya dahêner de xwedî agahîne tê lidarxistin.
6. Dramaya dahêner ji alîyê kesên ku rê û rêzikên van xebatan dikanin bînin cih ve tê lidarxistin.
7. Dramaya dahêner qadeke nav-dîsîplînî ye. Perwerde û şona du bingehên qewîne ku ji herduyan jî alîkarîyê digire.
8. Dramaya dahêner ji şanoye cuda ye lê ji şanoyê gelekî sûd werdigre.
9. Dramaya dahêner li mekaneke ku ji bo lidarxistina dramayê guncave tê lidarxistin.
10. Dramaya dahêner ne lîstike, lê ji taybetîyên lîstikan xwedî dibe.
11. Dramaya dahêner lîstikvanî nîne û kesên ku dramayê de cih digrên ne hewce ye ku lîstikvan bin.
12. Dramaya dahêner tenê ji beşên lê germbûyin û hevkarîgerîyê pêk nayê. Divê pevxistineke dramatik û jixweberî tê de hebe.
13. Dramaya dahêner dibe ku weke dersekê an jî weke rêbazekê bê bikaranîn.
14. Dramaya dahêner divê di çarçoveyeke şopandinê de pêş bikeve. Bûyer divê bi awayeke sistematik pêş bike.

Taybetîyên li jor divê drama dahêner li gor kîjan rêzikan bê lidarxistin li ber çavan radixe. Lidarxistina dramaya dahêner de hem kesên ku di nava komê de cih digirê hem jî kesên ku rêvebirina komê dike gelekî giring e. Xwendekar gava bi van taybetîyên dramaya dahêner beşdarê dramayê dibin, bi awayeke hêsan hînê mijaran û çareserîya mijaran dibe. Yek ji mebestên dramaya dahêner hêza dahênerî û xeyalî ya xwendekaran pêş bixe. Bi vê rêyê endamên komê divê xwe ji jîyana kesekî din re, pirsgirêkên di jîyana kesekî din re, xwe amade bike. Hevkarigerî dibe hêmana sereke ya dramayê. Xwendekar bi hevkarîgerîyê nêzê hevalên xwe dibe û bi hevre têkilîyê datîne. Kesên ku qabîlîyeta wan a dahênerîyê pêş ve diçe ji alîyê fikirîn, pêşbînî, lêkolînerîyê ve jî pêş ve diçe. Xwendekar, gava di nava çalakîya dramayê de bi bûyeran re rû bi rû tê taybetîyên xwe yên nizane û qabîlîyetên xwe yên ku nizane bi vê sayê kifş dike. Di nava van bûyeran de xwendekar hînê tevgerên estetîk dibe bêyî ku kes mudaxîl bibe. Di nava van meseleyan gişa da xwendekar hînê hevkarîyê dibe û dikare azad bifikire.

Nixon (1987), drama bikaranîna ziman û qabîlîyeta ziman zêde dike. Rê li ber şêweya axaftininên cuda vedike. Drama derfeta nirxandina rexneyî li ber ziman vedike (Adıgüzel, 2022:99). Dramaya dahêner gelek qabîlyetên nû li xwendekaran bar dike û hem jî qabîlîyetên ku haya wan jê tune ye derdixe holê. Kesê ku endamê koma dramaya dahêner e, bivê nevê divê bi endamên din re têkilîyê dayîne. Bi vê rêyê xwendekar mecbûr dimîne ku bi endamên din re biaxive. Axaftina rewan û herikbar destûrê dide ku xwendekar xwe baştir îfade bike. Xwendekar gava karibe xwe baş îfade bike, bixwe bawerîya wî zêde dibe û ji kesên derdor ve jî tê teqdîr kirin. Bi saya rolên ku xwendekar digirê hewceye awayê axaftina wan rolan bi cih bîne. Gava ji devê ajalekî an jî ji devê mirovekî cuda xeber dide, divê teqlîdeke baş bike. Ev yeka qabilîyeta axaftina xwendekar pêş dixe.

Mamoste, perwerdekar, rê pêşandêr an jî bi wateya xwe ya gelemperî perwerdekarê dramaya dahêner ew kes e ku ji bo endamên dramaya dahêner rêberîyê dike (Adıgüzel, 2022:102).

Yek ji hêmanên sereke ya dramaya dahêner rêberê dramayê ye. Lewra rêber fikrekê, armancekê an jî bûyerekê vedibêje û serbendan derbarê mijarê de vedibêje û xwe dide alî. Xwendekar an jî bi gotineke din endamên dramaya dahêner li gor

çarçoveya ku rêber dîyar kirîye lîstika xwe disêwirînin. Divê rêberê dramaya dahêner di qada xwe de û di derbarê qada dramaya dahêner de têr û tije be.

Rêberê dramaya dahêner, berîya dest bi dramaya dahêner bike divê plansazîya kesp, rêbaz, naverok û nirxandina mijara xwe pêş da dîyar kiribe. Rêberê dramaya dahêner divê bawerîya endamên komê berhev bike. Di nava lîstikê de cihê ku endamên komê tê de dialiqe divê rêber Karibe çareserîyan peyda bike.

2.1.1. Perwerde û Dramaya Dahêner

İnci San (1991), Dramaya dahêner, bêyî nivîsek pêşnivîskî tenê bi qabîlîyetên wek ramanên orjînal, ji bîranînên subjektîf û li ser bingeha zanîna beşdarvanên xwe yên dahêner pêk tê (Yeğen, 2023:1-2). Dramaya dahêner, bikaranîna teknîkên wek jixweberî, lîstina rolan xwe têr dike û bi xebata komekî ve li ser fikrekî, bûyerekî an jî mijarekî tevî hest û ramanên endamên komê bi awayê lîstikê tê sêwirandin (Ataman, 2006: 77). Her mijar dikare bibe mijara dramaya dahêner. Ji ber serbestîya mijarên dramaya dahêner, meriv dikare wek rêbaz ji bo armanca xwe dikare di nava xebatên xwe de bi cih bike.

Ji bo ku meriv Karibe dramaya dahêner pêk bîne, divê komek hebe. Lewra dramaya dahêner bi têkilîya endamên komê ve pêk tê. Dramaya dahêner, di nava rêbazên dersdayînê de tê bikaranîn. Bi saya dramaya dahêner di nava rêbazên dersdayînê de teknîka sewirandinê cihê xwe xurt kirîye. Wek rêbazek nû bikaranîna dramaya dahêner bi taybetî ji bo pêşxistina kesayet û nasnameyê û lihevhatina civakî ye. (Adıgüzel, 2022: 72)

Yek ji erkên perwerdeyê takekesîya mirovan di nava civakê de geş bike û daneheva çandî ji nifşekî bigihêjîne nifşeke din. Bi vê sayê perwerde bandoreke baş li ser zarok û ciwanan çêdike. Di her qada jîyanê de perwerde ji her alîyê ve roj bi roj li jîyana mirovan bandorê çêdike. Perwerde tenê li dibistanan nayê hînkirinê. Serpêhatîyên di nava jîyanê de jî pir tiştan hînê meriv dike. Îro roj em li sîstema hînkirina perwerde yê dinihêrin, çawa ku tu tişt di cihê xwe de namîne û diguhere sîstema perwerde jî li gor daxwazên serdema xwe diguhere.

Perwerde berpirsîyarê dînamîzma perwerdekirin û çanda gel e. Di heman demê de di qada neqilkirina nifşan de ye, hewceye tiştên ku neqil dike bi helwesteke

zanistî bike. Ji ber vê yekê sîstema perwerdeyê tev giringîyê didin danasîna çandî, pêşvebirina çandî û neqilkirina çandî (Adıgüzel, 2022: 79).

Vê serdema ku serê xwe girtîye û diçe pir tişt guherandîye. Şert û awayên jîyana mirovan guherîye. Li hemberê van guherînan sîstema perwerdeyê weke berê nemaye. Berê zarok di malên bê televîzyon û telefon mezin dibûn, li derve di nava axê de bi hevalên xwe re dilîstin. Di nav jîyaneke xwezayî de mezin dibûn. Bes îro zarok bê telefon û tabletan namînin. Ev yeka ji alîyekî baş, ji alîyekî ve jî ne baş e. Zarokên vê serdemê di nava teknolojîyê de mezin dibe şêweya jîyana wan jî diguhere. Fam û famberîya wan jî diguhere. Li hemberê van guherînan divê sîstema perwerdeyê jî xwe biguherîne da ku zarokan bi temamî di hembêza teknolojîyê de bernede.

Adiguzel, pirtûka xwe ya bi navê "Di Perwerdeyê de Dramaya Dahêner" de wiha dibêje: Sîstema perwerdeya ku xwe pêşve nabe, xwe guncav nake cihê rexnekirinê ye. Lewra divê sîstema perwerdeyê bersîvê bide pêdivîyên serdema xwe. Di salên 1980 de li Tirkîyê di warê zanista dramaya dahêner de gelek nêrînên pêşketî derketin holê. Bi vê sayê dramaya dahêner bi serê xwe weke dersekî di qada perwedehîyê de cihê xwe girt. Yekem Bernameya Lîsansa Bilind ya Dramaya Dahêner di sala 1999an de li Zanîngeha Enqereyê vebûye. Bi saya van gavên mezin re dramaya dahêner cihê xwe qewîtir kiriye û bi wextê re cihê xwe di nava bernameyên MEBê de jî girtîye. Li zanîngehan di Beşên Perwedehîyê de di nava bernameyên mamostetîyê de weke derseke zarûrî tê dayînê.

2.1.2. Lîstik û Dramaya Dahêner

Di perwerdeya zarokan de lîstik gelekî giring e. Jixwe lîstik di xwezaya zarokan de heye. Lîstik bandoreke wî ya erênî li ser zarokan heye. Lîstik mijûlîya herî baş e ji bo derûnîya zarokan. (Özer, 2006:55)

Lîstik ji bo jîyana zarokan hêmaneke xwezayî ya mezinkirin û hînkirinê ye. Lîstik di her gava jîyana zarokan de ye. Bi saya lîstikê zarok hînê keşfkirinê dibe û bi derdorê xwe re dikeve nava têkilîyê. Lîstik li ser takekesîya zarokan gelekî bandorê çêdike bi vê sayê zarok di nava lîstikê de hînê alîkarî û parvekirinê dibe. Ev yeka bi xwe re têkilîya mirovan xurt dike.

Lîstik, di jîyana mirovan de xwedîyê fonksîyoneke sereke ye. Herçiqas bi demê re form û şêwaza wan bihên guhertin jî wekî aktîvîte her wextî rola sereke dilîzin di berdewamkirina jîyana mirovan da û bi taybetî di serdema zarokatîyê da. (Subaşı, 2021: 63)

Zarok bi rêya lîstikê re hînê hevkarîyê û karên kolektif dibe. Zarok bi saya lîstikê hînê hevaltîyê, hînê rêzgirtinê dibe û bi vê yekê re dibe yek ji endamên civakê. Zarok bi rêya lîstikê re li ser navê xwe û hevalên xwe na berpirsîyarîyan digre ser xwe ji xweparêzîyê dûr dikeve (Sabır, 2014:76).

Zarok bi bûyer û pirgirêkên di nava jîyanê de dijî di lîstikan de pê derdikeve pêş. Di nava lîstikê de van bûyer û pirsgirêkan çareser dike. Bi gotineke din em dikarên bibêjin ku zarok bi rêya lîstikê, antremanên jîyana pêşroja xwe dikin. Bi vê sayê hînê vehinartina hestên xwe jî dibin. Lîstik hêza xeyalkirina zarokan zêde dike û piştevanîya pêşvebirina ziman û têkilîya di navbera mirovan de zêde dike.

Adıgüzel, taybetmendîyên lîstikan wisa rêz dike; azadî, teqlîd kirin, hebûna du rewşî, vezelandin, lihevxistin, xwesertî, dema niha, beşdarbûn, tevger, vehinarina wextê, danîna rê û rêbazan. Gava zarok lîstikê dilîze biwê newê bi astengîyan re rû bi rû tê. Di çareserkirina van astengîyan de ev taybetmendîyên ku li jor rêzkirîye bikartîne û bi ser dikeve.

Merheleyên lîstikan li gor temenê zarokan û mezinbûyina wan diguhere. Zarok serê ewil de bixwe tenê dilîze piştre lîstikên derdorên xwe temaşê dikin û herî dawî bi kesên derdora xwe re têkilîyî datîne û wisa dilîze. Ev yeka ji bo zarokan hem ji alîyê geşedana fizîkî hem jî ji alîyê geşadana hişî ve baş e. Lîstika ku ewqas ji her alîyekî ve li zarokan bandoreke erênî çêdike helbet xwe bêyî destûr berdaye nav qada perwedehîyê. Zarok li ku derê dibin bila bibin bi rêya lîstikê re bi hevre têkîlîyê datînin û hevaltîyên baş peyda dikin. Li dibistana çawa ku zîlê navberan lêdide zarok tev bi hevre direvin hewşa dibistanê û bi hev re dilîzîn. Kêfxweşîya ku ji lîstikê digrin bêyî ku haya wan jê hebe li ser geşedana wan bandoreke mezin çêdike. Gava rewş wisa be ev lîstika ku zarokan ewqas kêfxweş dike li dibistanê di navberan de nemîne û xwe berde nava dersan dê zarok bêhtir kêfxweş bibin.

Têkilîya di navbera lîstik û drama dahêner de bi bîranîna wan taybetmendîyên lîstikê hêsantir dibe. Wekî ku tê bîra me, lîstik hêmanên şahîyê, rêgez, azadî, nakokî, dualî û bi vî rengî taybetmendîyan vedihewîne. Lîstik amûrek

bingehîn e ji bo pêşketin û mezinbûnê. Bêyî lîstikê jîyaneke bi bandor û pêşkeftineke silamet pêk nayê. Lîstik ji bo zarok bi qasî xwarin û vexwarinê giring e. Di nava pêngav û vesazkirina dramaya dahêner de lîstik cihekî wî yê giring heye. Gotina dramaya dahêner û lîstik heman tişt in dibe ku ne rast be. Lêbelê lîstik xwe dispêre dramaya dahêner, dramaya dahêner jî xwe dispêre lîstika. Pişta hevdu xurt dikin û alîkarîya hevdu dikin.

Bawerkirin, biryargirtin û danûstendina xalên hevpar ên di navbera drama û lîstikê de ne. Wekî din, dramaya dahêner û lîstik xwedî taybetmendîyên perwerdeyê ne û ji bo hînkirina hin behreyan têne bikar anîn. (Adıgüzel, 2006:66)

2.1.3. Şano û Dramaya Dahêner

Li gor Levent (1987), di nava perwerdeyê de xebatên şanoyê û dramaya dahêner û wek rêbazekî bikaranîna rêbaza dramaya dahêner di nava perwerdeyê de rê vedike li ber kesayetîya pir alî û ji xwe bawer. Şano û dramaya dahêner taybetîyên kesayetîya meriv di nava civakê de xurt dike, li meriv peyda dike (Adıgüzel,2022: 257).

Gelek hêmanên hevpar di navbera şano û dramaya dahêner de heye. Li gor San (2008), cudahîya herî mezin di navbera şano û dramaya dahêner de temaşevan in. Lewra di lîstina şanoyê de divê temaşevan hebin, di lîstina dramaya dahêner de hewce nake temaşevan hebin. Herçiqas armanca herdu şaxan bixwaze kesên ronakbîr û lêkolîner têbigihêjîne, dawîya dawîn dramaya dahêner şaxeke pedegojîyê ye û şono şaxeke hunerê ye (Sefer, 2023:62).

Dramaya dahêner gelekî sûd ji şanoyê werdigre û gelek taybetmendîyê wan yê hevpar hene. Dramaya dahêner xwe ji rêbazên şonoyê têr dike, tevî van hêmanan dîsa jî du qadên cudane ku hevkarîgerîya hevdu dikin (Adıgüzel, 2022:265).

Drama dahêner û şano du formên cûda yên performansê ne ku gelek hevşibin lê di heman demê de hin cûdahîyên giring jî hene. Drama dahêner çalakîyek e ku giringîyê dide pêvajoya afirînerî û dahênerî ya beşdaran. Şano li ser pêşkêşkirina lîstikek bi senaryoyê disekine. Drama dahêner bi gelemperî wekî amûrek perwerdeyê li xwendingeha û cîhên din ên perwerdeyê tê bikar anîn, şano bi gelemperî ji bo mebestên şahîyê tê bikar anîn. Di dramaya dahêner de rêber an jî mamoste heye ku, di şanoyê de derhêner heye.

Di dinya ya zarokan de lîstik di lûtkeya jîyana wan de ye. Dema mezinek bi lîstikekî derdikeve hemberê zarokan, zarok gelekî kêfxweş dibin. Şano jî yek ji van qadên ku bala zarokan dikişine. Ji ber ku di nava şanoyê de jî lîstik heye. Em dikarin bibêjin ku zarok di qada şanoyê de serketîne. Lewra zarok di piçûktîya xwe de mezinan teqlîd dikin û malikan dilîzin an jî bijîşkî an jî mêwefiroşî hwd. Ev lîstikana wan di vê qadê de dike xwedî ezmûn û di nava jîyanê de dikarin xwe baştir bi cih bikin. Di nava bernameyên dersan de, beşên cuda li ser hev bandorê çê dikin. Şano û dramaya dahêner jî bi heman awayê bandorê li ser hev çê dikin.

Di perwerdeyê de şano, wekî di dramaya dahêner de bi pênc sehekan dest bi lê germbûyinê dike. Di destpêka lêgerimbûyînê de mebest têkilîya di navbera endamên komê de xurt bike û endaman nêzî hevdu dike (Kuyumcu, 2007:119). Şano û dramaya dahêner gelek xalên wan yê hevpar hene. Lê bi temamî ne wek hev in. Ji alîyê bikaranîna teknîkê ve gelekî dişibin hevdu.

2.1.4. Pêngav û Vesazkirina Dramaya Dahêner

Dramaya dahêner bi tena serê xwe xwedî mebest û xwedî teknîkên hînbûnê ye. Tevî van taybetîyên xwe em dikarin bibêjin ku dramaya dahêner bi tena serê xwe dersek e. Drama dahêner hem bi tena serê xwe ders e hem jî alîkarîya dersên dinan dike. Drama dahêner li dor pirsên kî, çi, çima, li kur, kengî, çawa tê li darxistin û li gor xelqeya bersîvên van pirsan geş dibe. Hêmanên bingehîn yên bûyeran wek destpêk, geşedan, amûr û alav, mekan û encam rêzikên bûyeran e û ji bo çareserîyê jî meriv heman rêzik tête şopandin.

Încî San, dibêje ku azmûn û serborîyên endamên komê ji bo geşedana lîstikê giring e. Ji ber ku rêbaza çareserkirina her endamekî dibe ku cuda be. Ev cuda bûn rê li ber têkilîyên cuda vedike. Kesê ku beşdarê dramaya dahêner dibin û bi xeyalên xwe û dahênerîya xwe teknîkên cuda hîn dibin.

Dramaya dahêner, ji encamê zêdetir bi pêvajoyê ve girêdayî ye. Serpêhatîyên jîyanê bi awayekî jixweberî di nava dramayê de xwe nîşan dide. Dramaya dahêner di nava sêgoşeya serok, endam û naverokê ve pêk tê. Cihê ku serok pêdivîyê bibîne mudaxilê dramayê dike. Ev pêvajoya tev dramaya dahêner pêk tîne. (Adıgüzel H. , 2006:23)

Di dramaya dahêner de awayê jixweberîyê pir giring e. Ji ber ku gava endam awayê jixweberîyê dikin bi hev re têkilîyê datînin. Ev têkilî û hevkarîgerî ji bo pêvajoya dramayê gelekî giring e. Di dramaya dahêner de temaşevan tune nin, tenê endamên komê hene. Em dikarin bibêjin ku endamên komê hem temeşavan hem lîstikvanin. Hema hema her mijarek dibe ku bibe mijara dramaya dahêner. Bûyerek, nûçeyeke rojnameyan, wêneyek an jî bîranînek dibe ku bibe mijara dramayê. Di heman demê de mijareke dersê jî dibe mijara dramayê. Hilbijartina van mijaran û lidarxistina van mijaran de xwendekar her carê taybetîyeke xwe derdixe holê. (Adıgüzel H. , 2006:23)

Mijarên dramaya dahêner dibe ku her tişt be. Ji bo mijara dramaya dahêner sînorek nehatîye danîn. Dramaya dahêner tenê ne ji bo xwendekar an jî zarokan e, ji bo mezinan jî tête bikaranîn. Ne tenê di qada perwerdeyê de di qadên cuda de ji bo armancên cuda tê bikaranîn. Ji bo xebata xwe em li ser qada perwerdeyê bisekinîn. Em ê di nava xebata xwe de dramaya dahêner ji bo hînkirin û çalakîya dersa Kurdî(Kurmancî) bikar bînin.

Dema em li pêngav û vesazkirinên dramaya dahêner dinihêrin em dibînin ku li ser vê mijarê teqez agahîyek nehatîye dîyarkirin. Ji bo pêvajoya lidarxistina dramaya dahêner em ê xwe bispirên rêbaza ku Adıgüzel pejirandîye. Lewra Adıguzel jî xwe spartîye xebata ku ji alîyê Zanîngeha Enqerê ve hatîye kirin. Zanîngeha Enqereyê, 34 kes ji pêşengehên bernameya dramaya dahêner ya Enstîtuya Zanistên Perwerdeyê, 40 pêşengeh ji bernameya mamostetîya dramaya dahêner ya Komeleya Dramaya Dahêner, anîye gel hev û ji bo lidarxistina dramaya dahêner biryar girtine. Piştî nirxandinên hevpar herî dawî biryar ji bo vesazkirina dramaya dahêner wisa dane; germbûyîn, lîstik, jixweberî, pêkanîn û nirxandin (Adıgüzel H. , 2006:25):

2.1.4.1. Germbûyin-Lîstik

Lê gerimbûyîn ev tiştek e ku kesek xwe li hemberê tiştekî nêzîk hîs bike û xwe jê dûr pê negre. Di vê qonaxê de endamên komê tevî laşê xwe, fikrên xwe, zanîn qabîlîyetên xwe bi hestên bawer divê daxilê nava komê bibe. Di vê qonaxê de mamoste, mak an jî rêber ji bo dînamîkên komê xurt bike rêgezên ku dîyar kirîye bi endamên komê re parve dike.

Armanca sereke ya vê qonaxê afirandina dînamîkên komê ye û her wiha amadekirina endamên komê ji bo qonaxeke din. Ev qonax di heman demê de barê giran ya dramaya dahêner digire ser milê xwe û dixebite ji bo endamên nû daxilê nava komê bûne an jî cara yekeme ku dramaya dahêner nas dike, nêzê hevdu bike û wan li hev germ bike. Di vê qonaxê de mamoste ji bo ku endamên komê an jî xwendekaran nêzî hevdu bike û fedîya wan birevîne, lîstikên zarokan an jî lîstikên ku hatine hilberîn dide lîstin. An jî suhbeteke cuda vedike li gor mebesta mijara xwe.

Divê taybetmendîyên lîstikên ku mamoste hilbijartîye xwedî taybetmedîyên şahîyê be. Lewra dema xwendekar dilîzin divê xwe pê rihet hîs bikin. Lêbelê, piştî demekê di hin koman de dibe ku kêf bibe armanca sereke, an jî bêyê derbasê qonaxeke din dibe, ev qonax bixwe wekî çalakîyên dramaya dahêner were hesibandin. Ji bo ku rê li ber pirsgirêk wisa neyê vekirin divê ji beşdaran re were behs kirin ku lîstik tenê beşek ji nava dramaya dahêner e. Pêşketina vê qonaxê bi wê yekê ve girêdayî ye ku rêber divê koma xwe baş nas bike û naveroka dramaya dahêner li gor hewcedarîya komê amade bike. Di vê qonaxê de lêkolînên bingehîn têne kirin da ku zûtirîn pêvajoya ragihandinê di navbera beşdaran û rêber de, di navbera kom û cihê de were destpêkirin û saz kirin.

Ji bo koma destpêkê divê lîstik bêhtir ji bo ragihandin û danûstandinê bê lîstin. Lîstina rol û jixweberîyê jî divê ji bo vê armancê were bikaranîn. Li vir armanca sereke ew e ku beşdaran ji bo qonaxên din ên dramaya dahêner amade bike. Mamoste beşdarên dramaya dahêner dike çend kom ji bo ku kanibin bi rihetî bi hevdu re têkilîyê deynin.

Bi taybetî komên ku di çalakîyên dramaya dahêner de nû ne, divê mamoste bi qasî ku pêkan be beşdarê çalakîyên germkirinê bibe. Di qonaxên destpêkê de beşdarên komê dibe ku hem fedî bikin hem jî ji bo ku nebin pêkenî xwe ji lîstikê dûr bigirin. Loma divê mamoste bi awayekî aktîf di nava lîstikê de cih bigirê û beşdaran ji wan gumanan rizgar bike.

Di nava qonaxa gerimbûyînê de mamoste ji bo ku xwendekar kanibin xwe îfade bikin û rihet hîsbikin hin caran dikare navberên piçûk bide û li gel wan suhbetê bike. Ji bo ku xwendekar xwe di nava lîstikê de rihet hîsbikin, cihê ku xwendekar tê de dialiqin mamoste divê alîkarîya wan bike.

2.1.4.2. Sêwirandin-Jixweberî:

Sêwirandin ew tiştek e ku aktîfkirina rewşekî an jî bûyerekî ye. Bi nîşandayîna bûyerekî an jî ketina şûna kesekî yanê teqlîdkirina kesekî, awayê sêwirandinê pêk tîne. Ev qonax ji bo dramaya dahêner gelekî giring e. Lewra xwendekar an jî beşdarên dramaya dahêner di vê qonaxê de xwe zêdetir îfade dikin û qabîlîyetên xwe pêşkêş dikin. Di nava dramaya dahêner de mijar di vê qonaxê de şêwe û dirûv digrê û derdikeve pêş.

Di vê qonaxê de teknîkên wek lîstina rolan û teknîka jixweberîyê cih digire. Hemû serpêhatî, parvekirin û nirxandinên di nava çalakîyên dramaya dahêner de, li gorî encamên sêwirandin û jixweberîyê tê nirxandin. Bikaranîna stratejîyên ku ji bo çareserkirina mijara dîyarkirî, bi piranî di vê qonaxê de derdikeve pêş. Sêwirandina vê beşê endamên komê dikare tena serê xwe jî pêk bîne an jî dikare bi komên piçûk an jî komên mezin re pêk bîne. Qonaxa din dikare li ser pêkhatina ku di encama sêwirandinê de derdikeve pêş were domandin.

2.1.4.3. Pêkhatin

Dramaya dahêner bi lê germbûyin û lîstinê det pê dike û bi sêwirandinê ve temam dibe. Beşa pêkhatinê encama qonaxên berîya xwe ye. Dramaya dahêner ji nuqteyek ne dîyar ve dest pê dike. Pêvajo dê çawa bimeşe an bi ku ve biçe ne dîyar e. Zanîn, azmûn û serborîyên endamên koma dramaya dahêner rê dide vê yekê û bi xwe re qonaxa pêkhatinê derdixe holê. Amûr, alav û malzemeyên ku pêwîst be dikarin bên bikaranîn.

Pêdivîya bikaranîna materyalan di pêvajoyê de jî ji beşdaran tê. Carinan jî ji bo vê yekê amadekarî neyê kirin jî beşdar dikarin tiştên li hawirdora wan hene wê gavê wekî materyal bikar bînin. Berî qonaxa damezrandinê ji nuqteyeke nedîyar an jî bi bikaranîna malzemeyên wek, tişt, wêne, û materyalên li dor vê qonaxê tije û temam dike.

2.1.4.5. Nirxandin-Nîqaş

Encamên ku di xebatên dramaya dahêner de têne bidestxistin di vê qonaxê de têne nirxandin. Bi gotineke din di vê qonaxê de girîngîya mijarê tê nîqaş kirin û hest û raman têne parve kirin. Di vê qonaxê de ka kî-kê ji mijarê çi fam kirîye, ev bûyer an jî mijar li ser jîyana meriv çawa bandorê çêdike, tête tespît kirin.

Endamên koma dramaya dahêner di vê qonaxê de nêrînên xwe bi awayeke nivîskî jî dikarin ji bo mamoste ragihînin. Awayê nivîskî derfetê dide xwendekaran ku nerasterast, bi awayê nepenî fikr û ramanên xwe bi mamoste re parve bikin. Di hin warê din de heke rêbaz dramaya dahêner bê bikaranîn, encama dramaya dahêner weke pîvanekî derbasdar dibe. Mînak, heke rêbaza dramaya dahêner, ji bo dersa zanistên civakî wek rêbaz bê pejirandin divê pîvanên nirxandinê ji bo kesb a dersê derbasdar be. Di warê ku dramaya dahêner wek rêbaz tê bikaranîn, nirxandin û encama dramaya dahêner dibe wek pîvanekî bê hesibandin.

Di encamê de, fêrbûna bi lîstin, ezmûn, xwe nasîn, hevkarîgerîya nava komê, rexnekirin û nîqaşkirin li şûna fêrkirina yekalî ya mamoste bêhtir bandorê li ser xwendekar û endamên koma dramaya dahêner çêdike. Ev yeka rê li ber têkilîya xwezayî ya xwendekaran di navbera hevdu de vedike da ku bêhtir alîkarîya hev bikin, ji ezmûn û tecrubeyên hevdu îstîfade bikin.

Ji bo ku ev encam were bidestxistin yanê xwendekar bi awayekî aktîf di nava dersê û di nava çalakîyên dramaya dahêner de cih bigirin divê mamoste bi berfirehî vesazkirin û pêngavên dramaya dahêner zanibe.

BEŞA SÊYEM

MÎNAKA PLANSAZÎYA DRAMAYA DAHÊNER JI BO DERSA KURDÎ (KURMANCÎ)

Armanca vê plansazîya dersa Kurdî ne ew e ku, mijarên dersê seranser bi vê rêbazê hînê xwendekaran bike. Rêbaza dramaya dahêner di nava vê xebatê de ji bo çalakîya dersê hatîye amadekirin. Armanca vê plansazîyê ew e ku dramaya dahêner bibe pirek, di navbera mamoste û xwendekaran de. Mamoste, bi saya rêbaza dramaya dahêner dikare xwendekarên xwe baştir nas bike û li gor pêdivîyê wan alîkarîya wan bike. Rêbaza dramaya dahêner, vegotina dersa yekalî ji holê radike û di şûna wî de derseke piralî û rengîn derdixe holê. Ev plansazî, sînorên di navbera xwendekar û dersê de radike û rê li ber geşbûna dersê vedike. Lewma jî mamosteyên vê rêbazê bikarbînin hewce dike berîya derbasê vê çalakîyê bike, divê derseke tevî nivîs û xwendin tê de ye li gel xwendekarên xwe pêk bîne.

Her xwendekarek xwedî taybetmendîyeke cuda ye. Di polekî de, gelek xwendekar hene ku şêweyê hinbûna wan cuda ye. Lewma divê mamoste derseke hevpar çê bike ya ku xîtabê polê gişkî bike. Rêbaza dramaya dahêner dibe alîkar ku her xwendekar tevî taybetmendî, şêwe, azmûn, qabîlîyet û serborîyên xwe daxilê nava dersê bibe. Ev mijarên ku me ji bo dramaya dahêner dîyarkirine, ji pirtûka pola pêncan ya dibistana navîn hatîye hilbijartin û li gor pêngav û vesazkirina dramaya dahêner hatîye amadekirin.

Ev plansazîya li gor şert û mercên rewşa gelemperî hatîye amade kirin. Mamosteyên ku van çalakîyan ji bo dersa xwe bikar bîne, dikare li gor ast û rewşa xwendekar xwe guherînan pêk bîne. Dikare wext û mekanê biguherîne an jî alav û amûran li gor rewşê zêde bike an jî ji nava mijarê derxe. Ji ber ku dramaya dahêner azadîyek berfireh li ber mamoste û xwendekaran datîne. Meseleya giring ew e ku mamoste encameke baş û xweş ji dersa xwe wergire. Helbet divê bi heman awayê xwendekar di dawîya wan çalakîyan de kêfxweş û dilrihet be û kêfa wî ji dersê re hatibe.

3.1. Malbat

Ev plansazî li ser mijara malbatê xebitîye. Divê çalakîyê de me giringî da ku xwendekar hem endamên malbatê nas bike hem jî erkê wan yê di nava malbatê de hîn bibin.

Ders: Kurdî (Kurmancî)

Wext: 40-50 deqe

Pol: 5

Mijar: Malbat

Mekân: Pol

Amûr: Qutî, kaxiz û pênûs

Armanc

1. Pêşxistina rêzikên dramaya dahêner û pêşxistina wan rêzikan di nava çalakîya dramaya dahêner de.
2. Pêşxistina qabîlîyeta jixweberîyê û tevî van qabîlîyeta daxilbûyîna nava lîstikê.
3. Pêşxistina fikr û xeyalan û tevî van fikr û xeyalan karibe di nava dramaya dahêner de tevbigere.
4. Pêşxistina xebata komê, tevî komê û hevalan karibe tevbigere.
5. Pêşxistina hêza îfadekirina bi laş.
6. Pêşxista hişê xeyalî
7. Endamên malbatê binase
8. Girîngîya malbatê û têkilîya di nava malbatê de hînbibe.
9. Erkên endamên malbatê hîn bibe.

Pêvajo

Germbûyin:

Mamoste muzîkekî bi rîtm vedike. Ji xwendekaran dixwaze ku herkes di nava polê de li paş hevalekî xwe bimeşe. Çend deqe derbas bû şûnde dengê muzîkê bilind dike û bi dengekî bilind dibêje, bila her kes hevalê xwe biguherîne. Bila her kes bi lez bimeşe û rawestin.

Dema mamoste van gotinan ji xwendekaran re dibêje divê mamoste bixwe jî di nava lîstikê de be û wî kelecanîyê bixwe jî bijî.

Lîstik:

Di vê beşê de xwendekarek dibe pîrik (mak), berê xwe dide dîwar û heta 10an dijmêre. Heta ku hevalê pîrik hejmaran dijmêre hevalên li paş tev hereket dikin, gava pîrik hejmar qedand û li wan vedigere divê kesek hereket neke. Heke pîrik, kesekî hereket dike bibîne ew ji lîstikê derdikeve.

Jixweberî

Di vê beşê de teqlîdkirin di lûtkeyê de ye. Lewra mamoste derbarê endamên malbatê de û di derbarê erkên endamên malbatê de hin hevokan saz dike, wan hevokan li kaxizên piçûk dinivîsîne, dixe nava qutîyekî. Ji nava polê xwendekarekî hildibijêre û xwendekar ji wê qutîyê hevokekî hildibijêre. Hevokê di hundurê xwe de dixwîne û peyre wek lîstika sînemaya bêdeng, bikaranîna laşê xwe ve van hevokan rave dike û hevalên di polê de bi nîşandayîna hevalên xwe, wê-wî endama malbatê texmîn dikin û erka wê-wî ya di nava malbatê de vedibêjin.

Berîya destpêka lîstikê divê mamoste xwendekaran haydar bike ji naveroka lîstikê û ev lîstik çawa tê lîstin.

Pêkanîn

Di vê beşê de mamoste rê li ber xwendekarên din ên polê vedike. Mamoste di serî de behs dike, ger hevalekî nikaribe hevoka xwendîye pêk bîne ji xwendekarên polê kesek dikare di şûna wê de rabe.

Nirxandin

Mamoste di vê beşê de rê li ber xwendekaran vedike da ku fikr û nêrînên xwe vebêjin. Ev beş ji bo ku xwendekar kêmasî an jî qabîlîyetên xwe bibînin û kanibin li ser vê meseleyê xeber bidin gelekî girîng e. Ev beş bêsînor e, heta xwendekar dikarin li ser hevokê mamoste nivîsîye jî xeber bidin. Mînak, erka vê endamên malbatê bi vê hevokê baştir dîyar dibû, an jî ev endam zêdetir di nava malbatê de bi vê erka xwe tê nasîn û hw.

Xwendekar, di derbarê tevger an jî bikaranîna laş de jî fikrên xwe vedibêjin. Mînak, ev tevger bi vî awayî na, bi vî awayî din vebigota ew ê hevalan zûtir an jî baştir fambikira û hw.

3.2. Hevnasîn

Li jêr plansazîya dersa Kurdî li gor rêbaza dramaya dahêner hatîye amadekirin. Ev plansazî, di xwe de mijara 'Hevnasîn'ê dihewîne. Di vê plansazîyê de mebest ew e ku xwendekar hem dîyalogên hevnasînê pêk bînin, hem karibin bi awayekî kolektif bi komê re hereket bikin. Ev plana ku amade bûye, li gor derseke 40-60 deqê ye.

Ders: Kurdî (Kurmancî)

Wext: 40-60 deqe

Pol: 5

Mijar: Hevnasîn

Mekan: Pol

Hejmara Polê: 20 kes

Amûr: 10 gogên rengîn (divê rengê wan ji hevdu cuda be û gogên plastîk yê piçûk be)

ARMANC

1. Pêşxistina rêzikên dramaya dahêner û pêşxistina van rêzikan di nava çalakîya dramaya dahêner de.
2. Pêşxistina qabîlîyeta jixweberîyê û tevî van qabîlîyeta daxilbûyîna nava lîstikê.
3. Pêşxistina xebata komê, tevî komê û hevalan karibe tevbigere.
4. Pêşxistina hêza îfadekirina bi laş.
5. Pêşxista hişê xeyalî
6. Karibe kesên derdora xwe nas bike.
7. Hevokên di hevnasînê de kîjan in û gava meriv hevdu nas dike çi dipirsin tevî pirs û bersivan hîn bibe.

Pêvajo

Germbûyin:

Mamoste ji xwendekaran re dibêje bêyî ku bi hevdu re biaxivin, bi tevgeran ji hevdu re behsa tiştan bikin. Xwendekar bi muzîkê re ji cihê xwe radibin di nava polê de digerin û bêyî ku bi hevdu re biaxivin tenê bi îfadeyên laş suhbet dikin.

Lîstik:

Mamoste di vê beşa lîstikê de, gogan bi kar tîne. Mamoste ji xwendekaran dixwaze ku xwendekar bibin du kom û li hemberê hevdu rawestin. Yanê divê li hemberê her xwendekarekî, xwendekarekî din rawestîya be. Mamoste li gor xwe, bi awayekî tevlihev gogan li xwendekar belav dike. Ji ber ku gog deh heb in, divê di destê deh xwendekaran de gog hebe. Mamoste navê kîjan xwendekarê bibêje, ew xwendekar goga di destê xwe de davêje ji hevalekî goga wî tuneye re. Xwendekarên din jî bi heman awayê ê ku gog di destan de ye, davêjin ji yên ku goga wan tuneye re. Piştî dora yekem diqede mamoste dibêje kê gog avêtibû ji we de divê hûn gogê dîsa bavêjin ji wî-wê re.

Jixweberî

Di vê beşê de dîsa mamoste dîyalogekî hevnasînê bi dengê bilind dixwîne.

A: Silav

B: Silav

C: Navê te çi ye?

E: Navê min _____

D: Tu çawa yî?

E: Ez baş im, spas dikim.

F: Tu çend salî yî?

G: Ez 11 (yanzdeh) salî me.

H: Tu diçî kîjan xwendingehê?

F: Ez diçim Xwendingeha Navîn a Feqîyê Teyran.

Mamoste, ev tîpên ku di dîyalogê de cihê kesan girtîye li ser gogan dinivîsîne. Mînak li ser her rengekî tîpekî datîne. Ev dîyalog ji xwendekaran re xwend şûnde ji nava polê deh xwendekaran hilbijêre. Her xwendekar ji xwe re rengekî ango tîpekî hilbijêre. Mamoste dubare dîyalogê dixwîne. Dema mamoste dîyalogê dixwîne her xwendekar li gor goga destê xwe, li hevoka xwe xwedî derdikeve. Mînak, heke A bibêje silav, divê peyre hema bersîva Ayê derkeve û hevoka xwe bibêje. Di dîyalogê de pênc hevok pirs in, pênc hevok jî bersîv in. Mamoste ji xwendekaran re dibêje bila hevokên ku pirs in li alîyekî bisekinin, bila hevokên bersîv in derbasê alîyekî din bisekinin.

Ger hewce bike mamoste dîsa dîyalogê dixwîne. Xwendekar, hevoka xwe li gor tîpan di hişê xwe de pê digre. Her xwendekarekî hevoka xwe di hişê xwe de pêgirt şûnde lîstik dest pê dike. Ji bo ku xwendekar vê dîyalogê pêk bînin mamoste wextê dîyar dike (ev wext li gor fama xwendekaran û li gor kanîna wan diguhere). Mînak mamoste ji xwendekaran re divê hûn vê dîyalogê li gor rêzê di nava 7 deqe yan de pêk bînin. Mamoste wextê dide destpêkirin û xwendekar li gor pirs û bersivan qasê ku dikanin dîyalogê pêk tînin.

Pêkanîn

Di vê beşê de xwendekar hişê xwe dide ser tîpa li ser gogê dinivîsîne û hevoka ku divê bêje di hişê xwe de pê digrê. Ev erka di nava lîstikê de têra xwe kelecanîyê dixe nava xwendekaran. Li hemberê kîjan pirsê kîjan bersîv tê gotinê divê di navbera xwe de heta ku wext xelas nebûye bersîva wê bidin. Ev beş bi beşa jixweberîyê ve girêdayî ye. Di beşa jixweberîyê de çi diqewime, çawa pêk hatibe wek encam di vê beşê de cih digre.

Nirxandin

Di vê beşê de kom derbasê cihê xwe dibin. Mamoste hestên xwendekaran dipirse. Dramaya dahêner çawa pêk hat, dema wext kêm dibû we çi hîs dikir? Çend pirs hate bersivandin û yê ku nehatine bersivandin çima nikaribûn bibersivînin.

3.3. Hejmar

Li jêr plansazîya dersa Kurdî li gor rêbaza dramaya dahêner hatîye amadekirin. Ev plansazî, di xwe de mijara “Hejmar”an dihewîne. Ev plana ku

amade bûye, li gor derseke 60-80 deqeyê ye. Berîya çalakîya dramaya dahêner divê mamoste derseke bi vegotin û nivîs li gel xwendekarên xwe çêkiribe. Lewra ev çalakîya dramaya dahêner ji bo ku xwendekar kanibin bifikirin û li gel hejmaran kanibin têkilîyê di navbera hejmar û çîrokan de deyne hatîye amade kirin.

Ders: Kurdî (Kurmancî)

Wext: 60-80 deqe

Pol: 5

Mijar: Hejmar

Mekan: Pol

Hejmara Polê: 20 kes

Amûr: 20 darik (ço)

ARMANC

1. Pêşxistina rêzikên dramaya dahêner û pêşxistina van rêzikan di nava çalakîya dramaya dahêner de.
2. Pêşxistina qabîlîyeta jixweberîyê û tevî van qabîlîyeta daxilbûna nava lîstikê.
3. Pêşxistina xebata komê, tevî komê û hevalan karibe tevbigere.
4. Pêşxistina hêza îfadekirina bi laş.
5. Pêşxista hişê xeyalî
6. Karibe hejmaran rêz bike
7. Hejmaran ji 1î heta 100î nas bike.

Pêvajo

Germbûyin:

Ji bo ku mijar hejmar e, mamoste xwendekaran li mijarê germ bike lîstika "Çi Got" dide lîstin. Ji ber ku xwendekar di dersên ewil de hînê hejmaran bûne ev lîstik hem ji bo dubarekirina hejmara û hem jî ji bo destpêka dramayê dê baş bibe. Mamoste ji polê re dibêje ez ê bi dengekî nizm di guhê hevalê we de hejmarekê bibêjim, divê hevalê we li dû hejmara min gotîye kîjan hejmar tê, ew ê di guhê hevalê xwe de wî hejmarê bibêje. Heta ku hevalên polê xelas dibe, divê hûn hejmara min gotîye li dû hevdu rêz bikin. Di dawîyê de li ser kê-kî qedîya be ew ê jî hejmara dawîn bibêje. Peyre mamoste di serî de kîjan hejmar gotîye û li dû mamoste kîjan hejmar rêz bûne em ê tespît bikin.

Lîstik:

Mamoste ji bo ku berîya dramaya dahêner xwendekar xwe hinekî rihet hîs bikin û fedîya xwe birevînin di vê beşê de lîstikekî dide lîstin. Mamoste, alîkarîyê ji xwendekarekî di polê de dixwaze ji bo ku darikan li hevalên xwe yê polê belav bike. Darik belav bûn şûnde, mamoste vedigere polê û dibêje ji we kî dixwaze bireqse. Bêyî zorê xwendekarek bi daxwaze xwe radibe. Mamoste dibêje ew ê hevalê we, li hemberê we bireqse hûn ê jî bi darik ên destê xwe ji bo wî rîtmekî lêdin.

Jixweberî

Di vê beşê de mamoste ji xwendekaran dixwaze, herkes sandalyeya xwe bigirê û bi awayekî gilover li gel hevdu rûnin. Mamoste jî sandalyeya xwe digirê û daxilê nava giloverê dibe. Mamoste dibêje em ji 1î heta 100 î hînê hejmaran bûn. Niha ji we herkes yek bi yek dê derbarê pênc hejmaran de ew ê çîrokekî ji me re bibêje. Ji 1î heta 100î hûn dikarin hejmaran bikarbînin. Hejmarên dubare qebûl nabe. Ji bo ku xwendekar baş têbigihêje mamoste dikare bixwe wek mînak di serî de çîrokekî vebêje. Bo mînak:

1: rojekê ez rabûm 1î li derî xist

10: ji min re got gazî 10 kesan bike, em ê biçin daristanê. Mi go çima?

23: Got bavê min li daristanê 23 baq êzing berhev kirîye.

30: Mi go heke bavê te 23 baq berhev kiribe divê em herî kêm 30 kes biçin.

40: Me gazî 40 hevalê xwe kir û em ketin ser rê ya daristanê.

Mamoste mînakek wisa da şûnde xwendekar tev bûyer an jî çîroka herî kêm pênc hejmar tê de heye difikirin û li gor rêzê dest pê dikin. Ji bo ev beş bi kelecanî derbas bibe, mamoste dikare wextê jî dîyar bike. Mînak bibêje herkes çîroka xwe nava 5 deqeyan de divê vebêje.

Pêkanîn

Xwendekar di nava vê lîstikê de hem li ser hejmaran hem jî li ser bûyerekî an jî li ser çîrokekî difikirin. Xwendekar tevî vegotin û xeyalkirinê dikare hestên xwe û fikrên xwe bi laşê xwe jî îfade bike. Heke xwendekar nikaribe wê çîrokê hilberîne divê mamoste zêde aciz neke û dorê bide xwendekarekî din.

Nirxandin

Di nava vê geşedana dramaya dahêner de mebest ew e ku xwendekar bi hebûna xwe yanê bi fikir û ramanên xwe bi kelecanîya xwe û bi kanînên xwe daxilê nava dersê bibe. Mamoste li gor pêngavên dramaya dahêner mijara dersê bi xwendekaran dide dubare kirin. Di nava vê geşedanê de mebest tenê hînkirina mijarê jî nîne. Divê xwendekar fedîya xwe birevînin û kanibin di nava dramaya dahêner de xwe îfade bikin. Di nava dramaya dahêner ev xîmana bi dest xistin şûnde xwendekar kêfxweş dibin. Di beşda nirxandinê de mamoste û xwendekar pirs û bersîvan li hevdu vedigerînin.

3.4. Çîroka Şengê û Pengê

Ders: Kurdî (Kurmancî)

Wext: Saetek û 40 deqe

Pol: 5

Mijar: Çîrok

Mekan: Pol

Hejmara Polê: 20 kes

ARMANC

1. Pêşxistina rêzikên dramaya dahêner û pêşxistina van rêzikan di nava çalakîya dramaya dahêner de.
2. Pêşxistina qabîlîyeta jixweberîyê û tevî van qabîlîyeta daxilbûyîna nava lîstikê.
3. Pêşxistina xebata komê, tevî komê û hevalan karibe tevbigere.
4. Pêşxistina hêza îfadekirina bi laş.
5. Pêşxista hişê xeyalî

Pêvajo

Germbûyin:

Mamoste ji xwendekaran dipirse, ger hûn ajalek bûna hûn ê bibin kîjan ajel? Dema hûn pir birçî bibin we dê çi bikira? Xwendekar difikirin û peyre bersivê didin.

Lîstik:

Mamoste ji xwendekarên polê re dibêje herkes bila bibe komeke pênc kes. Mamoste ji polê dipirse. Perperok çawa tê dinyayê? Ewil wek kurmekî piçûk e. kozika xwe de dikeve teşeyê perperokê. Dema di kozika xwe de wexta xwe temam kir, ji kozika xwe derdikeve û êdî wekî perperokekî bi baskên xwe difire.

Niha bila herkes zayîna perperokê bifikire û peyre bi koma xwe re vê geşedanê pêk bîne.

Jixweberî

Mamoste divê beşê de ji xwendekaran re dibêje ez ê niha çîroka Şengê û Pengê bixwînim. Peyre ji we kî bixwaze, li gor naveroka çîrokê bi hevalên xwe re bi awayê jixweberîyê çîrokê bisêwirîne.

Hebû tunebû bizinek, û du karikên wê hebû. Rojekî bizin ji karikên xwe re dibêje:

- Ez dê herim derve biçêrim. Bila şîr têkeve guhanên min hûn jî kanibin têr guhanên min bimijin. Lê heta ku ez werim derî ji kesî re venekin. Dema ku ez vegerim ez dê ji we re vê stranê bibêjim;

‘Şenga min Penga min

Dêya we çûye zozana

Xwarîye pelê kizwanan

Şîr ketîye guhanan

Zûkin, werin danan!'

- Piştî ku min ev stran ji we re got, wê demê hûn dê derî vekin. Baş e?
- Baş e daye!

Û bizin diçe. Gurekî jî bi dizî guhdarîya wan dikir. Gur tê û li derî dixe. Şengê û Pengê dibêjin:

- Ew kî ye?

Gur dibêje:

- Ez im, ez dêya we me!

- Na! Tu ne dêya me yî. Dengê dêya me ne wiha ye. Jixwe tu strana dêya me jî nizanî.

Roja din gur baş guhdarîya wan dike. Piştî ku bizin diçe çêreyê gur tê li derî dixe. Şengê û Pengê:

- Ev kî ye?

Gur dengê xwe zirav dike û dest bi stranê dike:

Şenga min Penga min
Dêya we çûye zozana
Xwarîye pelê kizwanan
Şîrketîye guhanan
Zûkin, lezkin werin danan!

Şengê û Pengê bawer dikin ku ew dêya wan e. Derî vedikin ku weeyy, ev çi ye! Ev gur e. Gur wan dibe û diçe. Dibe êvar. Bizin ji çêreyê tê malê ku çi bibîne? Mala wê giş tevlihev bûye û Şengê û Pengê jî xûya nakin. Bizin digrî û dibêje:

-Şenga min, Penga min hûn li ku ne?

Lê tu deng ji derekî nayê. Bizin difikire û dibêje hebe nebe ev karê gur e. Bizin yekser diçe ser xanîyê gur û teperepê dike.

Gur dibêje:

Ew kî ye li ser xanî min teperepê dike!

Firaq û kevçîyê min tije toz dike

Jina min hevîr dike.

Bizin dibêje:

Ez im ez, bizana zêrîn

Kê birîye Şenga min

Kê birîye Penga min

Were qal û çenga min

Gur dibêje:

Min birîye Şenga te

Min birîye Penga te

Ez têm qal û çenga te

Gur û bizin li rasta mala gur dest bi şer dikin. Êrîşî hev dikin. Bizin bi ser dikeve. Dawî bizin diçe. Şengê û Pengê ji destê gur rizgar dike. Şengê û Pengê diçe hembêza dêya xwe. Bizin, wan maçî dike û bi hev re diçin mala xwe.

Çîroka min çû dîyara, rehmet li dê û bavê guhdaran..

Ev çîrok hate xwendin şûnde, mamoste dibêje ji we kî dixwazin vê çîrokê qasê ku di bîra wî de maye bisêwirîne. Mamoste xwendekarên ku dixwazin qasê karekteran hildibijêre û derfetê dide wan çîroka ku bîhîstine li gor xwe bisêwirînin.

Pêkanîn

Xwendekar, di nava vê lîstik û jixweberîyê de qasê ku çîrok di hişê wan de maye disêwirînin. Dibe ji ber xwe hin tiştan li nava çîrokê bar bikin. Divê mamoste rê bide ku xwendekar li gor xeyal û qabîlîyetên xwe çîrokê bisêwirînin.

Nirxandin

Di vê beşê de xwendekar dikarin li ser naveroka çîrokê fikrên xwe bibêjin. Ev çîrok behsa çi dike, ji wê çîrokê çi hînbûn li bersiva pirsên wisa dikarin bigerin. Xwendekar dikarin li ser sêwirandina hevalên xwe şîroveyan bikin.

3.5. Pîşe

Li jêr plansazîya dersa Kurdî li gor rêbaza dramaya dahêner hatîye amadekirin. Ev plansazî, di xwe de mijara "Pîşe"yan dihewîne. Ev plana ku amade bûye, li gor derseke 40-60 deqeyê ye..

Ders: Kurdî (Kurmancî)

Wext: 40-60 deqe

Pol: 5

Mijar: Pîşe

Mekan: Pol

Hejmara Polê: 20 kes

ARMANC

1. Pêşxistina rêzikên dramaya dahêner û pêşxistina van rêzikan di nava çalakîya dramaya dahêner de.
2. Pêşxistina qabîlîyeta jixweberîyê û tevî van qabîlîyeta daxilbûyîna nava lîstikê.
3. Pêşxistina xebata komê, tevî komê û hevalan Karibe tevbigere.
4. Pêşxistina hêza îfadekirina bi laş.
5. Pêşxista hişê xeyalî
6. Pîşeyan nas dike
7. Derbarê erk û karê pîşeyan de dibe xwedî agahî

Pêvajo

Germbûyin:

Mamoste ji xwendekaran dipirse, di nava malbata we de kîjan pîşe hene. Kêfa we ji kîjan pîşeyê re tê. Dema hûn mezin bibin, hûn dixwazin bibin xwedî kîjan pişeyê?

Lîstik:

Mamoste ji xwendekaran dixwaze ku herkes rabe ser pîyan û di nava polê de giloverekî çêbikin. Xwendekar tev rabûn û gilover çêkirin şûnde mamoste ji

xwendekaran re behsa lîstikê dike. Mamoste ji xwendekaran re dibêje, niha divê hûn tev çavên xwe bigrin dema xwendekaran çavê xwe girt mamoste li paş xwendekaran digere û digere peyre hêdika destê xwe li milê xwendekarekî dixe û wî kesê wek pîrik hildibijêre. Dema xwendekaran çavê xwe vekir, divê ev xwendekar xwe di nava hevalên xwe de dîyar neke. Bi awayekî nepenî tevbigere. Mamoste li çepikan dixwe û xwendekar tev çavên xwe vedikin. Mamoste dibêje ku niha min ji nava we, hevalekî we hilbijart ew tenê dizane ku min ew hilbijartîye. Niha divê hûn bêyî ku biaxivin di nava polê de bigerin bi awayekî tevlihev. Herkes dema di nava polê de digere divê li rûyê hevdu binêre. Pîrik bi dizî ji kê re çavê xwe biqirpîne ew kesa ji lîstikê derdikeve. Lewma divê hûn rastê pîrikê neyin. Lîstik dest pê dike.

Jixweberî

Mamoste ji xwendekaran re dibêje. Îro em ê biçin dikana pîşeyan û em ê ji dikanê ji xwe re pîşeyekî bistînin. Ev pîşeyê ku em dixwazin bîstinên bê biha ye. Lê dema hûn diçin dikanê û dixwazin ji firoşkar pîşeyekî bistînin divê hûn firoşkar qanih bikin. Hûn çima dixwazin bibin xwedîyê pîşeya ku dixwazin? Pîşeya ku dixwazî çi erkên wî hene? Tu bibî xwedî pîşeya ku dixwazî, tu yê çibikî?

Mamoste ji nava polê xwendekarekî hildibijêre. Ew xwendekar dibe firoşkar, xwendekarên din yê polê yek bi yek tên cem firoşkar. Ji bo pîşeya ku dixwaze bi firoşkar e dîyalogan datîne. Heke firoşkar qanih be, pîşeya ku dixwaze dide hevalê xwe. Heke qanih nebe nade.

Pêkanîn

Xwendekar di nava vê dîyalog û gengeşîya ku bi firoşkare dike, hem pîşeya ku dixwaze tîne ser ziman hem jî çima wê pîşeyê dixwaze. Li gor wê bi tevger, xeberdan û lîstikvanîya xwe pîşeya ku dixwaze vedibêje.

Nirxandin

Bi saya vê dramaya dahêner xwendekar qabîlîyeta xwe ya axaftinê pêş dixe. Fikr û nêrînên xwe yê derbarê pîşeyan de tîne ser ziman. Di vê beşê de mamoste zêdetir dixwaze xwendekar fikr û hestên xwe îfade bikin.

3.6. Xwendingeha Min

Li jêr plansazîya dersa Kurdî li gor rêbaza dramaya dahêner hatîye amadekirin. Ev plansazî, di xwe de mijara xwendingehê dihewîne. Divê mijarê de mebest ew e ku xwendingeh ji bo xwendekaran çi îfade dike û xwendingeh di jîyana xwendekaran de çima girînge li ser van meseleyan bisekine.

Di nava çalakîya dramaya dahêner de têgeh û hevokên derbarê mijarê de tê bikaranîn. Ev plana ku amade bûye, li gor derseke 60-80 deqeyê ye. Berîya çalakîya dramaya dahêner divê mamoste derseke bi vegotin û nivîs li gel xwendekarên xwe çêkiribe. Lewra ev dramaya dahêner bi armanca ku mijar di hişê xwendekaran de baş bi cih be û hem jî ji bo xwendekaran bibe çalakîyeke dersê hatîye amadekirin.

Ders: Kurdî (Kurmancî)

Wext: 60-80 deqe

Pol: 5

Mijar: Xwendingeha Min

Mekan: Pol

Hejmara Polê: 20 kes

ARMANC

1. Pêşxistina rêzikên dramaya dahêner û pêşxistina van rêzikan di nava çalakîya dramaya dahêner de.
2. Pêşxistina qabîlîyeta jixweberîyê û tevî van qabîlîyeta daxilbûyîna nava lîstikê.
3. Pêşxistina xebata komê, tevî komê û hevalan karibe tevbigere.
4. Pêşxistina hêza îfadekirina bi laş.
5. Pêşxista hişê xeyalî
6. Karibe hestên xwe û fikrên xwe îfade bike.
7. Karibe derbarê girîngîya xwendingehê de fikre xwe vebêje
8. Karibe taybetmendîyên kelûpelên li dibistanê alîkarîyan wan dike, rêz bike.

Pêvajo

Germbûyin:

Mamoste pirseke derbarê xwendin û nivîsandinê de ji xwendekaran dipirse. Mînak: Dema hûn nexwazin bi kesekî re xeber bidin lê di heman demê de jî divê hûn ji wî-wê kesê re behsa meseleyekê bikin we yê çi bikira û we yê bi çi awayê behsa meseleya xwe bikira? Li gor pirs û bersîvan ev beş didome.

Lîstik:

Mamoste ji her xwendekarekî kelûpelên li dibistanê tête bikaranîn digire û li ser maseya xwe kom dike. Ji bo ku navê wan kelûpêlan were bîra xwendekaran, mamoste dikare tek tek navê wan bi xwendekaran bide dubare kirin. Mamoste di vê beşê de lîstika nêzîk û dûr dide lîstin. Mamoste ji xwendekaran re behsa lîstikê dike.

Niha em ê ji nava we hevalekî derxin derveyê polê. Em ê ji van kelûpelên dibistanê yekî hilbijêrin û di nava pol de veşêrin. Em dê gazî hevalê we bikin û ew ê hevalê we were li ser maseyê binêre ka kîjan malzeme tuneye bibîne û peyre di nava polê de li malzemeya ku me veşartîye bigere. Dema hevalê me li vê malzemeye digere em ê jî bi peyvên dûr û nêzîk alîkarîya wî bikin. Heke hevalê we nêzîkê malzemeyê bû em ê bi dengê bilind bibêjin nêzîk, heke ji malzemeyê dûr bikeve em ê bibêjin dûr.

Jixweberî

Mamoste xwendekaran re dibêje, bila her kes ji cihê xwe rabe û bi hevdu re di nava polê de giloverekê çêbikin. Mamoste gotinên xwe didomîne û dibêje, niha divê ez çi bibêjim hûn di nava hişê xwe de bisêwirînin û peyre tevgerên van gotinên min pêk bînin. Mamoste derbasê nava giloverê dibe hem ji bo ku hemû xwendekaran bibîne û hem jî dengê wê biçe xwendekaran. Mamoste dest pê dike û dibêje, niha hûn tev di nava cihê xwe de û di xew de ne. Dêya we bi dengê bilind bang li we dike, hûn dêya xwe dibîhîzin lê hûn naxwazin ji xew rabin.

Mamoste ji bo ku xwendekar van tevgeran pêk bînin çend deqeyan disekine û wan temaşe dike. Peyre berdewam dike, hûn ji xew rabûn, diçin dest û rûyên xwe dişon. Dêya we taştê amade kirîye, hûn taştêya xwe dixwin, peyre kincên

xwe yê dibistanê li xwe dikin. Çenteyê xwe kontrol dikin û davêjin milê xwe û xatir ji dayika xwe dixwazin û diçin li Erebeya ku we dibe xwendigehê siwar dibin.

Mamoste li vir navberê dide û dibêje ji we kî dixwaze bibe ajokarê erebeyê. Mamoste xwendekarekî hildibijêre û ji xwendekarên dinan re jî dibêje li paş ajokar rêz bibin. Ajokar erebeyê diajo di nava polê de xwendekaran li dû xwe digerîne û herî dawîyê digihîne xwendingehê. Xwendekar tev derbasê cihê xwe dibin.

Pêkanîn

Xwendekar di nava vê sêwirandinê de divê rihet bin û bi rastî jî li malê çawa tevdigerin kanibin di nava lîstikê de jî wisa tevbigere.

Nirxandin

Di nava vê geşadana dramaya dahêner de mebest ew e ku mamoste xwendekaran bide fikirîn. Her serê sibehê radibin û çawa amade dibin ji bo xwendingeha xwe. Çi jibîr dikin û çi kêmasîya wan hene. Xwe bi çi awayê xwe amade bikin dê zûtir û baştir bibe? Li ser pirsên wisa difikirin û li bersiva van pirsan digerin.

3.7. Jîyana Gund û Bajaran

Li jêr plansazîya dersa Kurdî li gor rêbaza dramaya dahêner hatîye amadekirin. Ev plansazî, di xwe de mijara "Jîyana Gund û Bajaran" dihewîne. Ev plana ku amade bûye, li gor derseke 60-80 deqeyê ye. Berîya çalakîya dramaya dahêner divê mamoste derseke bi vegotin û nivîs li gel xwendekarên xwe çêkiribe. Lewra ev çalakîya dramaya dahêner ji bo ku xwendekar bi rêya fikir, xeyal, azmûn û serborîyên xwe hînê mijarê bibe hatîye amadekirin.

Ders: Kurdî (Kurmancî)

Wext: 60-80 deqe

Pol: 5

Mijar: Jîyana Gund û Bajaran

Mekan: Pol

Hejmara Polê: 20 kes

ARMANC

1. Pêşxistina rêzikên dramaya dahêner û pêşxistina van rêzikan di nava çalakîya dramaya dahêner de.

2. Pêşxistina qabîlîyeta jixweberîyê û tevî van qabîlîyeta daxilbûna nava lîstikê.

3. Pêşxistina xebata komê, tevî komê û hevalan karibe tevbigere.

4. Pêşxistina hêza îfadekirina bi laş.

5. Pêşxista hişê xeyalî

6. Karibe taybetîyên gund û bajaran ji hevdu cuda bike

7. Karibe giringîya gund û bajaran di jîyana mirovan de têbigihêje.

Pêvajo

Germbûyin:

Mamoste ji xwendekaran dipirse, ji we kî gundî ye û kî bajarî ye? Ew ê di nava polê de deng bilind bibe û belkî xwendekarên nava polê tênegihêje ka kî gundî ye û kî bajarî ye. Lewma mamoste dibêje, ji we kî gundî ye bila rabe ser pîyan. Di nava polê de kelecanîyek çêdibe. Hevalên ku di nava polê de gundî ne radibin. Mamoste gotina xwe diguherîne û îja dibêje, ji we kî dixwest bibe gundî bila ew rabin ser pîyan. Temam! Niha jî ji we kî dixwest bibe bajarî bila ew rabin ser pîyan.

Mamoste û xwendekarên di nava polê de bi van pirs û bersîvan kêm zêde ji fikrên hevdu fam kirin. Ka kî gundî ye, kî bajarî ye û kî dixwest bibe gundî, kî dixwest bibe bajarî kêm zêde herkes hînê fikrên hevdu bûn

Lîstik:

Mamoste ji xwendekaran re dibêje bila herkes rabe û di nava polê de giloverekî çêbike. Gilover çê bû şûnde mamoste dibêje bila herkes destê hevdu bigre. Hinekî destê hevdu bişidînin, zêde na! hinekî. Destên hevdu berdin û qasê ji we tê bi dengê bilind biqîrin! Mamoste destê xwe bilind dike û bêdengîyê dixwaze. Peyre mamoste dibêje, niha di nava polê de bi awayekî tevlihev bigerin. Dema hûn di nava polê de digerin bila guhê we li min be. Belê, dest pê bikin û bigerin. Herkes dema di nava polê de digere li rûyê hevdu mêze bikin. Herkes bila li hemberê kesekî

bisekine. Bi awayekê hêrsbûyî li hevdu mêze bikin, niha jî bi awayekê rûken, niha jî bi awayekê biguman, niha jî bi awayekî ji xwe bawer mêze bikin.

Mamoste dema ji xwendekaran re dibêje li hevdu mêze bikin, hinekî wextê dide ji bo ku xwendekar baş kanibin li rûyê hevdu binêrin û ji hevdu fam bikin. Di heman demê de mamoste jî di nava polê de digere re û li tevgerên xwendekaran dinihêre.

Jixweberî

Mamoste ji xwendekaran re dibêje di serî de me behsa meseleya gund û bajaran kir. Niha ji we kesên kêfa wan ji gund re tê bila bibin komek û kesê kêfa wan ji bajar re tê bila bibin komek. Dibe ku mamoste di hin cihan de mudaxeleyan bike ji bo ku hejmara koman bibe qasê hevdu.

Xwendekar bûne du kom şûnde mamoste dibêje, niha bila her komek li gel hevdu rûne û di derbarê jîyana gund û bajaran de zanîn xwe û fikrên xwe bi hevdu re parve bikin. Peyre her komek di derbarê mijara xwe de lîstikekî divê bisêwirîne. Lîstika ku tê sêwirandin divê jîyana gund û bajaran li ber çavan raxe. Pirsgirêkên ku gundî dijîn an jî pirsgirêkên ku bajarî dijîn hûn dikarin daxilê nava sêwirandina xwe bikin.

Xwendekar di nava xwe de dişêwirin û erkan li hevdu parve dikin, peyre derdikevin mijara ku sêwirandine pêşkêş dikin.

Pêkanîn

Xebata komê û hevkarîgerîya nava komê dema sêwirandinê rûyê xwe nişan dide. Xwendekar çiqasî dikarin bi hevdu re têkilîyê deyin, tiştên ku di hişê xwe de sêwirandine çiqasî dikanin bi tevger û îfadeyên laşê xwe pêşkêş bikin di vê beşê de berbiçav dibe.

Nirxandin

Di vê beşê de ji destpêkê heta dawîyê yanê ji beşa Germbûyinê heta pêkanînê çi qewimî be tête nirxandin. Xwendekarên ku ji gund hez dikin çima hez dikin, xwendekarên ku ji bajar hez dikin çima hez dikin fikrê wan tête pirsin. Di nava jîyana gund de çi zehmetî hene û di nava jîyana bajar de çi zehmetî hene tête

xeberdan. Ev zehmetî û pirsgirêkên hene meriv çawa û bi çi awayê dikarin wan çareser bikin, li ser van mijaran dikarin biaxivin.

1. Tetbîqkirina Du Dersan Li Gel Xwendekaran

Du mijarên ku me ji nava dersan hilbijartîye li gel xwendekarên ku diçin pola pêncan hate tetbîqkirin. Ji wan mijaran yek mijara malbatê û yek jî çîroka Şengê û Pengê ye. Em ê li jêr behs bikin di encama pêvajoyê de, çi hatîye bi destxistin.

1.1. Malbat

Ev plansazî li ser mijara malbatê xebitîye. Divê çalakîyê de me giringî da ku xwendekar hem endamên malbatê nas bike hem jî erkê wan yê di nava malbatê de hîn bibin.

Ders: Kurdî (Kurmancî)

Wext: 40-50 deqe

Pol: 5

Mijar: Malbat

Mekan: Pol

Amûr: Qûtîyeke biçûk, kaxiz û pênûs

Armanc:

1. Pêşxistina rêzikên dramaya dahêner û pêşxistina wan rêzikan di nava çalakîya dramaya dahêner de.
2. Pêşxistina qabîlîyeta jixweberîyê û tevî van qabîlîyeta daxilbûyîna nava lîstikê.
3. Pêşxistina fikr û xeyalan û tevî van fikr û xeyalan karibe di nava dramaya dahêner de tevbigere.
4. Pêşxistina xebata komê, tevî komê û hevalan karibe tevbigere.
5. Pêşxistina hêza îfadekirina bi laş.
6. Pêşxista hişê xeyalî
7. Endamên malbatê binase

8. Girîngîya malbatê û têkilîya di nava malbatê de hînbibe.
9. Erkên endamên malbatê hîn bibe.

Pêvajo

Germbûyin:

Mamoste muzîkekî bi rîtm vedike. Ji xwendekaran dixwaze ku herkes di nava polê de li paş hevalekî xwe bimeşe. Çend deqe derbas bû şûnde dengê muzîkê bilind dike û bi dengekî bilind dibêje, bila herkes hevalê xwe biguherîne. Bila herkes bi lez bimeşe û rawestin.

Dema mamoste van komûtan dide xwendekaran, divê mamoste bixwe jî di nava lîstikê de be vê kelecanîyê bixwe jî bijî. Bi saya vê lîstikê xwendekar bi hevdu re têkilîyê datînin. Bi hevdu re dikenin, bi hevdu re baz didin û di navbera wan de têkilîyeke germ û xweş çêdibe.

Wêne 1

Lîstik:

Di vê beşê de xwendekarek dibe pîrik (mak), berê xwe dide dîwar û heta 10an dijmêre. Heta ku pîrik hejmaran dijmêre hevalên li paş giştik hereket dikin, gava pîrik hejmar qedand û li wan vedigere divê kesek hereket neke. Pîrik ji bo ku hevalên xwe bide kenandin dikare hin tevgeran an jî gotinên pêkenînê bêje. Heke pîrik, kesekî hereket dike bibîne ew ji lîstikê derdikeve an jî dibe pîrik.

Wêne 2: Xwendekarek bûye pîrik, pişta xwe bi hevalên xwe de kirîye û hejmaran dijmêre. Hevalên din jî heta pîrik hejmara dijmêre li gor dilê xwe tevdigerin.

Wêne 3; Pîrik li hevalên xwe vegerîya ye û wan dide kenandin.

Jixweberî

Di vê beşê de teqlîdkirin di lûtkeyê de ye. Lewra mamoste derbarê endamên malbatê de û di derbarê erkên endamên malbatê de hin hevokan saz dike an jî tenê navê endamên malbatê dinivîsîne. Hevok an jî peyvan li kaxizên piçûk dinivîsîne, dixe nava qutîyekê. Ji nava polê xwendekarekî hildibijêre û xwendekar ji wê qutîyê hevokekî hildibijêre. Hevokê di hundurê xwe de dixwîne û peyre wek lîstika sînemaya bêdeng, bikaranîna laşê xwe ve van hevokan rave dike û hevalên di polê de wê-wî endamên malbatê texmîn dikin û erka wê-wî ya di nava malbatê de vedibêjin. Berîya destpêka lîstikê divê mamoste xwendekaran haydar bike ji naveroka lîstikê û divê ji xwendekaran re behs bike ev lîstik çawa tê lîstin.

Wêne 4; Qûtîya peyvan amade bûye, mamoste du xwendekaran hildibijêre yek qûtîyê digire û yek jî peyvan hildibijêre.

Wêne 5; Xwendekar peyva ku hilbijartîye teqlîd dike.

Pêkanîn

Di vê beşê de mamoste rê li ber xwendekarên din ên polê vedike. Mamoste di serî de behs dike, ger hevalekî nikaribe hevoka xwendîye pêk bîne ji xwendekarên polê kesek dikare di şûna wê de rabe.

Nirxandin

Mamoste di vê beşê de rê li ber xwendekaran vedike da ku fikr û nêrînên xwe vebêjin. Ev beş ji bo ku xwendekar kanibin kêmasî an jî qabîlîyetên xwe bibînin û kanibin li ser vê meseleyê xeber bidin gelekî girîng e. Mamoste ji bo ku di dawîya vê çalakîyê de ji bo ku pîvanekî bi dest bixe hin pirsên berîya dersê amadekiriye li xwendekaran belav dike û ji xwendekaran dixwaze wan pirsan dagirin.

Di vê çalakîyê de ez hînê ……..bûm

Di vê çalakîyê de min herî zêde ji …… hez kir.

Di vê çalakîyê de ez ji alîyê …….. serkeftî bûm.

Di vê çalakîyê de min ji alîyê ……. zehmetî dît.

Di çalakîyeke din de ez ê ji bo …….. baldar bibim.

1.2. Çîroka Şengê û Pengê

Ders: Kurdî (Kurmancî)

Wext: Saetek û 40 deqe

Pol: 5

Mijar: Çîrok

Mekan: jûr

Amûr: Berû (maske)ya ajelên di çîrokê de derbas dibin.

ARMANC

1. Pêşxistina rêzikên dramaya dahêner û pêşxistina van rêzikan di nava çalakîya dramaya dahêner de.
2. Pêşxistina qabîlîyeta jixweberîyê û tevî van qabîlîyeta daxilbûyîna nava lîstikê.
3. Pêşxistina xebata komê, tevî komê û hevalan karibe tevbigere.
4. Pêşxistina hêza îfadekirina bi laş.
5. Pêşxista hişê xeyalî

Pêvajo

Germbûyin:

Mamoste ji xwendekaran dipirse, ger hûn ajalek bûna hûn ê bibana kîjan ajel? Dema hûn pir birçî bibin we dê çi bikira? Xwendekar difikirin û peyre bersivê didin.

Xwendekar 1: Ez ê bibûma kîvroş û min ê gêzer bixwara.

Xwendekar 2: Ez ê bibûma pisik û min ê li dû mişkan baz da.

Xwendekar 3: Ez ê bibûma kurmik û min ê sêv bixwara.

Bi saya van pirs û bersivan xwendekar derbarê xeyal, fikr û daxwazin hevdu de dibin xwedî agahî. Mamoste pişt re derbasê beşa din dibe.

Lîstik:

Mamoste ji xwendekaran dipirse. Perperok çawa tê dinyayê?

Xwendekar 1: Ewil kurmekî piçûk e. Li derûdora xwe hin tiştan dixwe. Peyre dikeve kozika xwe. Dema di kozika xwe de wexta xwe temam dike, êdî dibe perperok ûdifire.

Mamoste: ji we kî dixwaze xwedêdayîna perperokê bisêwirîne?

Wêne 6; Xwendekar dema perperok di kozikê de ye nişan dide.

Wêne 7; Xwendekar dema perperok wek kurmik e xwe nişan dide.

Wêne 8; Xwendekar xwe wek perperokê nişan dide û difire.

Jixweberî

Mamoste çîroka Şengê û Pengê bi xwendekarekî dide xwendin û lê zêde dike herkes guhê xwe baş bide çîrokê peyre ji we kî bixwaze ew ê vê çîrokê bisêwirîne.

Wêne 9; Xwendekar çîrokê dixwîne.

Hebû tunebû bizinek, û du karikên wê hebû. Rojekî bizin ji karikên xwe re dibêje:

- Ez dê herim derve biçêrim. Bila şîr têkeve guhanên min hûn jî kanibin têr guhanên min bimijin. Lê heta ku ez werim derî ji kesî re venekin. Dema ku ez vegerim ez dê ji we re vê stranê bibêjim;

‘Şenga min Penga min

Dêya we çûye zozana

Xwarîye pelê kizwanan

Şîr ketîye guhanan

Zûkin, werin danan!’

- Piştî ku min ev stran ji we re got, wê demê hûn dê derî vekin. Baş e?

- Baş e daye!

Û bizin diçe. Gurekî jî bi dizî guhdarîya wan dikir. Gur tê û li derî dixe. Şengê û Pengê dibêjin:

- Ew kî ye?

Gur dibêje:

- Ez im, ez dêya we me!

- Na! Tu ne dêya me yî. Dengê dêya me ne wiha ye. Jixwe tu strana dêya me jî nizanî.

Roja din gur baş guhdarîya wan dike. Piştî ku bizin diçe çêreyê gur tê li derî dixe. Şengê û Pengê:

- Ev kî ye?

Gur dengê xwe zirav dike û dest bi stranê dike:

Şenga min Penga min

Dêya we çûye zozana

Xwarîye pelê kizwanan

Şîrketîye guhanan

Zûkin, lezkin werin danan!

Şengê û Pengê bawer dikin ku ew dêya wan e. Derî vedikin ku weeyy, ev çi ye! Ev gur e. Gur wan dibe û diçe. Dibe êvar. Bizin ji çêreyê tê malê ku çi bibîne? Mala wê giş tevlihev bûye û Şengê û Pengê jî xûya nakin. Bizin digrî û dibêje:

-Şenga min, Penga min hûn li ku ne?

Lê tu deng ji derekî nayê. Bizin difikire û dibêje hebe nebe ev karê gur e. Bizin yekser diçe ser xanîyê gur û teperepê dike.

Gur dibêje:

Ew kî ye li ser xanî min teperepê dike!

Firaq û kevçîyê min tije toz dike

Jina min hevîr dike.

Bizin dibêje:

Ez im ez, bizana zêrîn

Kê birîye Şenga min

Kê birîye Penga min

Were qal û çenga min

Gur dibêje:

Min birîye Şenga te

Min birîye Penga te

Ez têm qal û çenga te

Gur û bizin li rasta mala gur dest bi şer dikin. Êrîşî hev dikin. Bizin bi ser dikeve. Dawî bizin diçe. Şengê û Pengê ji destê gur rizgar dike. Şengê û Pengê diçe hembêza dêya xwe. Bizin, wan maçî dike û bi hev re diçin mala xwe. Çîroka min çû dîyara, rehmet li dê û bavê guhdaran..

Ev çîrok hate xwendin şûnde, mamoste dibêje ji we kî dixwazin vê çîrokê qasê ku di bîra wî de maye bisêwirîne. Mamoste xwendekarên ku dixwazin qasê karekteran hildibijêre û derfetê dide xwendekaran ji bo çîroka bîhîstine li gor xwe bisêwirînin.

Wêne 10; Gur guhdarîya bizin û karikan dike.

Wêne 11; Gur dikeve hundir, şengê û pengê ditirse.

Wêne 12; Bizin tê malê û dibîne ku Şengê û Pengê tunene.

Wêne 13; Bizin û gur şer dike û bizin bi ser dikeve.

Pêkanîn

Xwendekar, di nava vê lîstik û jixweberîyê de qasê ku çîrok di hişê wan de maye disêwirînin. Dibe ji xwe hin tiştan li nava çîrokê bar bikin. Divê mamoste rê bide ku xwendekar li gor xeyal û qabîlîyetên xwe çîrokê bisêwirînin.

Nirxandin

Mamoste: we ji vê çîrokê çi fam kir?

Xwendekar 1: Mamoste, divê em derî li kesên bîyanî venekin

Xwendekar 2: Divê em jî bi dayika xwe biçûya derve.

Xwendekar 3: Kesên xerabîyê bikin encama wan jî xerab dibe.

Mamoste: Dema sêwirandinê hûn çi fikîrin we bi kîjan hestan çîrok sêwirand?

Xwendekar 1: ji ber ku ez bizin bûn divê ez xurtbûma û min zarokên xwe ji dest gur xelas bikira.

Xwendekar 2: Dema me derî vekir gur êrîşê hundir kir em tirsîyan

Mamoste: We berê karekterên vê çîrokê nas dikir?

Xwendekar 1: min Tirkîya vê çîrokê bîhîstibû bi saya vê çalakîyê ez hînê navê ajalên Kurmancî bûm.

Xwendekar 2: Erê, ez jî hînê navê ajelan bûm. Min navê gur û bizin bi Kurmancî nizanibû.

Xwedekar 3: Di nava çîrokê de tişta ku xweşa min çû strana bizin ji karikên xwe re dibêje bû.

ENCAM

Em dixwazin di dawî de encam û tesbîtên ku me di vê xebatê de bi dest xistine, nîşan bidin û rêz bikin.

Perwerdeya Kurdî di sedsala 7 an de bi avakirina medreseyan û bi pirtûkên dersan yê ku li medresayan dihat xwendin, cihê xwe di nava dîrokê de xurt kirîye. Alim û zanayên Kurd yê wê serdemê xwe ji bo xebata zimanê Kurdî xwe nedane alî û xwestine bi zimanê xwe xizmeta miletê xwe bikin. Meseleyên sîyasî yên li ser rûyê dinyayê qewimîne bi xwe re gelek guherîn pêk anîye. Miletê Kurd û perwerdeya zimanê Kurdî ji van guherînan bêpar nemaye û li gor pêdivîyên serdema xwe ev jî guherîne. Mînak, alfabeya Kurdî ya ku bi tîpên Erebî li medreseyan dihat dayîn, îro bi tîpên latînê di bin banên sazî û dibistanan de tête hînkirin. Helbet ev meseleya ji bo Kurdistana Bakur derbasdar e. Lewra hêj alfabeya Erebî ji bo zimanê Kurdî li başûr, rojhilat û rojavayê derbasdar e.

Perwerdeya Kurdî her ku diçe geş dibe û rêya xwe dibîne. Wekî di nava teza xwe de me dîyar kir, hêz û feraseta xwe ya ji medreseyan girtîye û îro bi heman awayê tevî çand û kelepora xwe temsîlîyeta miletê Kurd dike. Ev derfet û rêya li ber zimanê Kurdî bi şert û mercên zor û zehmet hatîye vekirin, derfetê dide miletê Kurd ku ew zêdetir li ser zimanê xwe bixebitin û pêş ve bibin.

Erka perwerdeyê divê li ser zarokan bandoreke erênî û baş çêbike. Ev bandora erênî û baş bi perwerdeyeke qalîte çêdibe. Lewma mamoste û perwerdekar divê li gor van guherînan xwe têr û tije bigrin û li gor pêdivîyên serdema xwe tevbigerin. Di perwerdeya zimanan de ango di hînkirina zimanan de gelek rê û rêbaz hene. Ev rê û rêbazên klasîk em dikarin wiha rêz bikin; xwendin, nivîsandin, guhdarî kirin, rêziman, axaftin. Bi rêya van xîman ve zimanek dikare bête nîşandayîn. Di nava teza xwe de me giringî da rêbaza dramaya dahêner.

Dramaya dahêner çalakîyek e, di navbera komekî de tê lîstin. Endamên lîstikê li derdora fikrekî têne gel hev. Lîstik bi saya teknîkên wek jixweberî û rolgirtinê tê sêwirandin. Dramaya dahêner ji alîyê serokekî an jî mamosteyekî ve tê vehinartin. Dramaya dahêner hewl, helwest, qabîyetên ku di hundirê zarokan de ye bi rêya lîstikê derdixe holê. Ji ber ku lîstikeke jixweberî ye bi qasê qabîlîyeta zarok û xwendekaran geş dibe.

